

# welat

## Li Welat xwedî derkevin

"Mucadeleya Topyekûn" a ku dewlet di her warî de li hem-ber têkoşîna gelê Kurd dimeşîne, di warê rojnamevaniyê de jî zêde dibe. Dewleta ku bi kuştinan nekarî pêşî li rojnamevaniya Kurd bigire, niha bi şewitandina erebeyên belavkirinê û tehdîtkirina bayyan dixwaze bigihîje armanca xwe. Ji bo ku dewlet di şerê xwe yê hovane de bi ser nekeve em gelê Kurd dawetî piştgiriya dikin û dibêjin li rojnameyên xwe xwedî derkevin.


Sal:1 Hejmar:42 6-12 Kanûn 1992 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

# HEP bi ku ve diçe?

Gelê Kurd bi hêviya bilindkirina dengê xwe, mebûsên HEP'ê hilbijartin û şandin Meclîsê. Bes îro, mebûsên HEP'ê, ji ber xwenûnekirinê, ne dikarin xwe biparêzin, ne jî kar û xebatên girîng bikin. HEP êdî nikare xwe wek nûnerê gelê Kurd bibîne. Jixwe gel jî êdî weke berê tiştekî zêde jê hêvî nake. Ji bo ku HEP jî nû ve, baweriya gel bi xwe bîne, divê xwe nû bike û bi bawerî bimeşe.

Rûpel 8




Dewlemendiyên  
Kurdistanê

Rûpel 6



Çirokbêjê  
Don'ê  
Şolohov

Rûpel 13



Kongreya  
ANAP'ê

Rûpel 5



# REWS



Abdullah Keskin

## Li Welat xwedî derkevin

**K**ovar û rojnameyên Kurdan îro di demeke pirr zor de ne. Em ne bê hêvî ne; ev dem jî wê derbasibe. Derbasbûna zehmetiyan bi mesûliyeta me tevan ve girêdayî ye. Ger em tev de ji her alî ve, li weşanên xwe xwedî derkevin ev dem wê zûtir xelas bibe.

Heta berî bi 2-3 salan, em ji kovarên mehane jî mehrûm bûn. Îro êdî rojnameyên hefteyî heta rojane derdikevin. Belkî amator bûn, kêmasî zêde bûn di van rojnameyan de, lê di jiyana me ya civakî û têkoşîna gel de rolekî (rîstekî) mezin leyîstin.

Berî bi 2-3 salan, Kurdistan çawa dihat nivîsandin? An "K..." bu, an "Ülkemiz", "Doğu Güneydoğu" bû. Rojnameya hefteyî Yeni Ülke ev 3 sal e ku derdikeve, heta niha ji sedî şêst hejmarên wê bi qerarê DGM'an hatine komkirin. Di heqê berpirsiyarên wê de bi sed salan ceza dixwazin. Özgür Gün-

dem jixwe, ji serî de bûye hedefa dewletê. Di 2-3 mehan de zêdeyî 30 hejmarên Gündemê kom kirin.

Heta niha bi dehan muxabir û xwendevan bi qerarên keyfî girtin. Lê yekê ji van fêde nekir. Ev 3-4 meh e, taqîtkên nû dicêribînin. Halit, Cengiz, Hafiz, Hüseyin, Çetin, Yahya, Namık û Apê Musa ... Hemû ji aliyê dewletê ve hatin qetilkirin. Girtin, komkirin, cezayê hepsê û peran fêde nekir, dest bi kuştina rojnamevanan kirin. Kuş-

**Li dijî çapemeniya MÎT'ê û Mehmetçikên rojnamevan, divê em çapemeniya xwe xurt bikin; em lê xwedî derkevin. Em rojnameyên xwe bikirin, belav bikin, bixwînin û bidin xwendin.**

tin jî ne çare bû. Îro dixwazin bi awayekî din rojnameyê Kurdî bertaraf bikin.

Li Kurdistanê, erebeyê tevî şoforê wê dişewitînin; ji ber ku Gündem, Yeni Ülke û Welat belav neke. Bayiyan tehdît dikin, wan ditirsînin, dikanên wan dişewitînin. Şirketa belavkirinê "Birleşik Dağıtım" berî bi mehekê tehdît kiribûn, du erebeyên we jî şewitandin; ji bo van rojnameyan belav

neke. Ev mehek, mehek û nîv e bi îmkanên xwe em dixwazin belav bikin, ji wî re jî dibine manî

Li aliyê din, ji ber ku rojnameyên Tirkî belav bibin, ji Reysêcumhûr Turgut Özal heta bi Serokwezîr Süleyman Demirel; ji bo kampanyayên belavkirina van rojnameyan seferber dibin. Ev 23 sal e ku, rojnameyên resmî li Kurdistanê tecrît bûne. Îro bi kûponan dixwazin dîsa serê Kurdan bi zanîn û provakasyonên MÎT'ê dagirin.

Berî bi çend salan Beşikçi, çapemeniya Tirk weke liqekî MÎT'ê didît. Ji bo van fikran di heqê Beşikçi de çend dawê vebûn, çiqasî di hepsê de ma herkes dizane. Lê, îro ew xwe bi xwe eşekere dikin.

Doğan Güreş, ji bo "xeberên" wan xelatan dîde û wan bi "Mehmetçikên rojnamevan" nav dike. Munaqeseyên di nav Mehmet Ali Birand û Emin Çölaşan de, bala we kişandiyê. Ew bi nivîs û pratîka xwe heq didine Beşikçi, Rojnamevanên Tirk ji sedî not "pêşî ajan in du re rojnamevan."

Li dijî çapemeniya MÎT'ê û Mehmetçikên rojnamevan, divê em çapemeniya xwe xurt bikin; em lê xwedî derkevin. Em rojnameyên xwe bikirin, belav bikin, bixwînin û bidin xwendin.

## FERHENGOK

- Bergirî:** Parêzî (savunma)
- Bano:** Prenses
- Bijang:** (kirpik)
- Birû:** (kaş)
- Cirr:** Helwest, karakter (tutum, huy)
- Çekxane:** Depo an jî karxaneyê çekan(silah deposu veya fabrikası)
- Dirinde:** Jakaw (yirtıcı, vahşi)
- Dagirker:** (sömürgeci, işgalci)
- Dagirgeh:** (sömürge)
- Doman:** Pêvajo, demajo, proses (süreç)
- Erdim:** Hêl, mintîqe, herêm (mintika, bölge, civar)
- Guldank:** (vazo, saksı)
- Hengame:** xure cîrr, xure xur (gürültü)
- Hejar:** Xezan, reben, belengaz
- Heras:** (nöbet, askeri nöbetçi)
- Herifandin:** Hêrifandin, wêrankirin (yıkamak)
- Hilperin:** Hilceniqîn (sıçramak, ürkme)
- Hilperistin:** Hilkişin (tırmanma)
- Kert:** Kêrt, niqir (oyuntu)
- Pirpizêk:** Pirpizik (çiğdem)
- Pêveder:** Bê oxir (uğursuz)
- Notirvan:** (korucu, bekçi, gardiyan, muhafız)
- Pişik:** Kezeba spî (akciğer)
- Pûç:** Petiyayî, riziwayî, qot (çürük)
- Ponijin:** Kûr fikirin (derin derin düşünmek)
- Qad:** War (alan)
- Qeliqîn:** Qilqilin (yerinde durmamak)
- Qerimîn:** (katlaşmak, donmak, uyusmak)
- Rawêj:** (varsayım, tahmin, zan)
- Rojing:** Kulek, bixêrî (baca)
- Rawir:** Kuvî, wahşî, cinawir (yabani)
- Zelû:** Zêlû, zilo (sültük)

## Xwişk û birayên niştîmanperwer

Karwan Caf

Hevalanî hêja!

Min bi navê xwe û hemû havalanî ke derneçûne li hilbijardina ku û ke xweyan pêşneyar kirdi bû wek berendam bo encumenî niştîmanî sêrtaserî Kurdistan.

Zor spasî hemû ew hevalan û xwişk û birayana dekêyn ke dengen xweyan da bi ême û propagandeyan bo ême kirdibû we burwayan pê man hebû bo ew erka piroze.

Beşdarbûnî ême lem hilbijartina li bo ewe bû ke Kurd be îradeyî xwey û be xwey parlamani xwe derxe, nek bi wîstî Amerika û welatanî Rojava û dagirkeran û kolonyalistanî Kurdistan.

Şayanî base ke maweyî kampanî hilbijar dinake kem bû we lew kateda her wek aşkêreya ke bo mavey yek mang şerekî narawayî brakuji sepaya ser Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) boye ême naçarbûyin ke helbisîn bi çêkirdinî komîteyî li dijî şer

bo ewey ke xelk kombikeyn ewa li dij ew şera û helgirse-naranî ew şera pîse riswa bikeyn.

Xwişk û birayên hê şa!

Her wek dezanin hilbijartinî yek encumenî sêrtaserî Kurdistan, deslewtêkî gelek mezin e li bo netewekeman û bê xwîn û pakî ew şehîdê nebêrdane hatuwatekawe ke bo yekemcar diruşmî serbixweyîyan berzkirdewe û yekemhengav yan na û ser rêgayî "Berxwedan jiyana e." Şayanî base sereray kurtî mawey kempanî hilbijartinaka bo encumenî Niştîmanî sêrtaserî Kurdistan ke çî (3073) mirovî Kurd û xelkî Kurdistan beşdariyan cem hilbijartinê kirdiwe, meş rasteûxwe ewe deselmênê ke be cay kemewa, nîwey ew xelke kurdey ke li welatî Swîd da deji li pişt ew encumeneweye, le-gel eweş ke ême li berhinde hoy teknîkî nemantwanî ke hemû kes agahdarbikeweye. Lem rudawa mejuyîye

(hilbijartinake), bi taybetî e Kurdaney ke li şehîdê durekan dijîn. Balam ême vahdî (soz) ewe dide ke bo mendatî dahatu her zor zû destbikewin bi kampanî hilbijartin bo ewey hemû mirovîkî niştîmanperwer û Kurdistanî butwanêt nunerî xwe hêlbi-gerêt. Ême her wek li katî propagandekirin bo encumen basmenkirdiwe û pêş eweş hemîşe li xebatî rojaneyî xwemur dupat man kirdiwe-tewe ke ême burwaman waya ke neteweyî Kurd yek neteweye welateke man yek welate û kêşekeman yek kêşeye boye debêt yek encumen hilbijêrin bo nimayende-kirdinî bizafî neteweyin bo bi desthênanî yek çareser bo kêşey reway gele stemdidekeman. Ême encumenî sêrtaserî Kurdistan li hemu hevalan û xwişk û birayanî amade bû û her weha hemu xelkî Kurdistan pîroz dikeyn û hewayî serkewtin bo encumen dexwazîn.

## Kurd û Kurdistan

Şerê netewî doza niştîman,  
Fikrek hemdemî bo gelê cihan,  
Şerê çekdarî cengek pirr giran,  
Serkeftin li te tê Kurd û Kurdistan

Mirin û mayîn ketin û rabûn,  
Namûs û rûmet hebûn û nebûn,  
Bi mal û rih û can bîne serxwebûn,  
Azadî li te tê Kurd û Kurdistan

Bajar û gund û çiya û zindan,  
Xarpêt û Gabar, Amed û Botan,  
Mazlûm û Egît, Zekîya û Bêrivan,  
Berxwedan li te tê Kurd û Kurdistan.

Jinek nû saz bû bi xwîna meyî sor,  
Bi rengê kesk û zer xemilî hewîrdor,  
Ala artêşê herdem hilde jor,  
Serxwebûn li te tê Kurd û Kurdistan!

Ferhat Rûbar / Yozgat

### Ali Ekber Eroğlu

Şervanê têkoşîna serxwebûn û azadiya gelê me, Ali Ekber Eroğlu, li girtîgeha Nevşehirê, di şertên dîlîtiyê de, roja 30'ê Cotmeha 1992 an de şehîd ket.

Ew bi dilevîni û baweriyê xwe ya ji bo serxwebûn û azadiyê, bi dilpakî û lehengiya xwe cihekî girîng di dilê girtiyan de digirt.

Em bi rêzdarî wî bi bîr tinin.

**Li ser navê dilên girtîgeha Nevşehir Mehmet Çelik**



Nûçeyên cengê

# Di salvegerê de têkoşîn dîsa geş bû



Di salvegera Partiya Karkerên Kurdistanê de, li çar aliyên Kurdistanê û li bajarên Tîrkiyê; wek Edene, Mêrsîn, Nazîllî û hin deverên Îzmirê gelê Kurd damezirandina PKK'ê bi meş û çalakîyên cur be cur pîroz kirin.

Navenda Nûçeyan- 26 Mijdar 1992 -Li Diyarbekirê li taxa 'Şehitlik'ê, gerilayan erebeyeke leşkeran gulebaran kirin. 2 serbaz (ast-subay) kuştin.

Li Batmanê li 'Üçyolê', ji bo salvegera damezirandina 15 saliya PKK'ê mitîngek çêbû. Roja 26'ê Mijdarê, ji Diyarbekirê, Sasonê, Hezo, Sêrtê, Batmanê û ji Farqînê xelk bi erebeyan hatin 'Üçyolê' û bi sloganên "Biji PKK" "Biji Scrok APO" meşiyên. Pişt re bi beşdariya xelkên gundê wê herême meşvan zêde bûn, rê ji erebeyan re girtin Nêzikî nivro hêzên dewletê hatin û dora meşvanan girtin û gulle reşandin ser meşvanan. 5 kes birindar bûn. Weke ku nûçeyên ji me re hatin xelkên 41 gundên herême beşdarî ve meşê bûn.

Li Edenê jî, Kurdan salvegera damezirandina 15 saliya PKK'ê pîroz kirin. Li taxa Dağloğlu 200 kes li cadeyekê, tekêl şewitandin û slogan avêtin. Dîsa li taxa Denizli jî, 100 kes meşiyên, bi molotofan Banqaya Ziraat'ê şewitandin û slogan avêtin. Li Unîversîteya Çukurova jî, şagirtan forumek çêkirin û slogan avêtin.

Di van bûyeran de gulle reşandin erebeyeke polîsan, 2 polîs birindar kirin.

Li Cizîrê jî xelk, li meydana cihê zad, li hev civiyan, alên ERNK û PKK'ê bilind kirin, govend girtin û slogan avêtin, piştî saetekê; polîs qerebalixê belav kir û gelek kes girtin. Li Diyarbekirê jî şagirtên 3 lîseyan neketin dersan, meşiyên û mekteban boykot kirin.

27 Mijdar 1992 -Li 23 bajarê Kurdistanê ji bo pîrozkirina salvegera damezirandina 15 saliya PKK'ê, kepenk hatin girtin.

Li Diyarbekirê %70 ê esnaf kepenk girtin. Polîs ên ku kepengên xwe girtin kişande vîdyoyê. Gelek kes jî neçûn ser karên xwe.

Li Ixdîrê û li hinek navçeyên wê; 'Aralık', 'Tuzla' yê jî kepenk

hatin girtin. Li Mêrdînê û li navçeyên wê yên Nisêbinê, Qoserê (Kızıltepe), Dêrikê û li Kerboranê (Dargeçit) jî kepenk hatin girtin.

Li van deran şofêran jî qontaxên erebeyên xwe girtin, şagirtan mekteb boykot kirin. Li Muşê li navçeya Xopê (Bulanıkê) û li Siwêrekê jî kepenk hatin girtin. Gundiyên gundên Şemrex (Mazîdağî) û yên gundên Melezgîrê meşiyên. Hêzên dewletê gulle reşandin ser meşvanan, gelek gundî birindar kirin. Li Gundê Diyarbekirê 'Kazıktepe' 2500 gundî mitîngek çêkirin. Li Edenê, esnafên taxên Dağloğlu, Anadolu, Barbaros, Gülbahçesi û 19 Mayîsê kepengên xwe girtin. Li Ruhayê şagirtên Unîversîteya Harranê, forumek çêkirin û sloganan avêtin. Li Mêrsînê esnafên taxên Demirtaş, Yenipazar, Barbaros û Gündoğdu'yê kepengên xwe girtin, 4 hezar karkerên Kurd jî neçûn ser karên xwe. Li taxa Yenipazar coşek çêbû û di nav gel û polîsan de şer derket. Erebeyeke polîsan, ji alî milîsên welatparêz ve hat gullebaran kirin, polîsekî birindar bû.

Di navbera Diyarbekir û Farqînê li Buşniqê erebeyeke leşkeran ket kemîna gerilayan, çawîşek û du leşker hatin kuştin.

28 Mijdar 1992 -Li Erzeromê welatparêzan pankart daleqandin û belavok belav kirin. Li navçeya Minîsê esnafan kepengên xwe girtin.

Li Batmanê li Hezo (Kozluk)'yê, gerilayan li taxa Yukarı Güneşli avêtin ser mala serokê cerdevanan Cemal Budak, cerdevanek kuştin, 2 jî birindar kirin.

Li Qoserê (Kızıltepe), gundiyên 7 gunda meşiyên, hêzên dewletê 450 kes girtin.

Li Ruhayê li navçeya Siwêrekê, gerilayan avêtin ser qereqoleke polîsan, 3 polîs birindar kirin.

Gerilayan di navbera Batmanê û Sasonê de rê birrîn; erebeyan sekinandin, qontrola nasnameyan kirin. Serokê cerdevanan kuştin.

Li nêzikî navçeya (Çelê) Çukurcayê ji konvoya leşkeran panzerê qelibî firînekê (uçurum), leşkerek mir, 5 leşker jî birindar bûn.

30 Mijdar 1992 -Li Ixdîrê gerilayan avêtin ser Şubeya Trafikê ya Emniyetê, roket avêtin û gullebaran kirin. Avahî xesar dît.

Li navçeya Nisêbinê, ji bo pîrozkirina salvegera damezirandina 15 saliya PKK'ê, meşek mezin çêbû. Ev meş ji taxên, Kışla, Yenituran Abdulkadirpaşa Cindioğlu, dest pê kir û li Meydana Newrozê bi-coşeke mezin dom kir.

1 Kanûn 1992 -Li Siwêrekê li taxa Hacıömer, polîsek ji alî milîsên welatparêz ve hate kuştin.

Li Mêrdînê li gundê Dara gerilayan 3 xayîn kuştin. Û wan bi darekê ve daleqandin. Li Mahsertê (Ömerliye) jî gerilayan li gundê Kocasırtê, xayinek kuştin, 3 gundî jî bi xwe re birin.

2 Kanûn 1992 -Li Mêrdînê li navçeya Qoserê kontr-gerîla yên dewletê ji gundê Alîdikê 7 gundî bi xwe re birin, wan kuştin û avêtin ser rîya di navbera Qoserê û Wêranşehîrê. Dewlet vî sûcê xwe jî di TV û rojnameyên xwe de, avêt ser gerilayan. Li ser vî bûyerê Serleşkeriya PKK'ê ya Eyaleta GAP'ê belavokê belav kir. Di belavokê de bûyer wiha tê nîrxandin: "Dewleta ku nikare têkoşîna gel bisekinîne diçe gundiyan qetil dike û suçên xwe yên qirêjî jî dixestûyê me. Lê em sond dixwinin ku emê heyfa (tola) van gundiyan hilînin."

Di navbera Diyarbekirê û Farqînê de gerilayan rê birrîn, erebeyan sekinandin, propaganda kirin û 5 xort bi xwe re birin.

Li Diyarbekirê serokê gardiyana yên girtîgeha Diyarbekirê ji alî hizbî-kontra ve hate kuştin.

3 Kanûn 1992 -Gerilayê ARGK'ê trêna ku ji Amedê diçû Misircê, li nêzikî Bismil sekinandin. Pişt re rêwî peya kirin û vagonek şewitandin.

## HAWAR

Dilbixwîn

### Mehkemekirina Demirel

**G**elo, însan evqasî jî derewan dike! "Mirov" evqasî jî, ji derewan avis dibe! Tu nema derewên S.Demirel guhê me biteqînin, ez ecêbmayî dimînim û dipirsim:

Di bin Demirel de mixazeya derewan hebe? Bi rastî mirov fedî dike li gotinen wî yên qelew guhdarî bike.

Roja 21'ê Mijdarê em nêzikî sed Kurdî li komeleya Hannoverê bûn. Saet di 18 an de (Li gora Almanya) me li nûçeyan guhdarî kir.

Weke her carê dîsa Demirel efendî li pişt mîkrofonan dest bi lewlebaziya xwe kir û got: "Di nava dinyayê de welatê herî demokratîk Tîrkiye ye. Li Tîrkiyê mafê mirovan heye... Kesek nikare welatê me parçe bike... Bi çend kalaşnikofan terorîst nikarin me bitirsînin...Em ji terorîstan natirsîn. Hemû çek û sîlehên ku di

nava destên wan de hebûn, me ji dest wan girtin, niha terorîst li wan çîyan bê sîleh digerin..."

Dema ku Demirel ev hevoka dawiyê lêv kir. Piqîni bi civatê ket. Welatparêzekî navsalî rabû ser piyan û got: "Erê! Me tu li jêr jî dîtî, li jor jî dîtî, me mehmetçikên te jî dîtî!..."

Ji hêla din welatparêze kî ku rojnameya Gündem di destên wî de, hêrs bû, li televizyonê dîk meyzand û got: "Em gerilayên xwe nas dikin Silo! Şoreşger xwîna xwe dilop bi dilop dirijînin û dîsa jî, dev ji sîleha xwe ber nadin. Lê hema hûn; hûn mîna dêlikan û dûvê xwe dixine devê xwe, her qehremanekî me bi çil tajiyên we ne..."

Di wê kêliyê de jinek li ser sindoqê bû, dengê xwe dîda. Dema ku ew gotin bihîst, berê xwe da televizyonê û got: "Tifûû! Gotinên xwe yên her roj vedigerîne. Xwe dixapîne dixwaze me jî bixapîne..."

Mehkemekirina Demirel berdewam kir, ji hêla jorê ve yekî dengê xwe bilind kir û got: "Bi xêr meclîs têye avakirin, wê hikûmeta me jî were çêkirin, dema ku biryara îdamkirina van terorîstan derkeve, ez hingê hazir im wê biryarê bi cih bînim..." Yekî din, xwe ji hêla din ve avête jor û got: "Na bavo na! Wê kuştina wezîrên Tirk bi destê min be."

Welatparêzekî çay belav dikir, ji nişkê ve sekinî û got: "Ez dizanim kîjan bêbavî dikujim, hûn tenê xayîn Hikmet Çetin ji min re bihêlin..."

Gelê me bi vî giyanê nêzikî dijminê xwe dibe. Ji niha ve bingeha avakirina dadgehên gel tene danîn. Li her derê, bi her awahî gel, di nava xwe de dijminan derdixe mehkemeyê.

Belê, Demirel dikare bibêje çend terorîst di şikeftan de mane, lê hema nikare reva mehmetçikên xwe ji ber wan "terorîstan" bisekinîne...

**Gelê me bi vî giyanê nêzikî dijminê xwe dibe.**

**Ji niha ve bingeha avakirina dadgehên gel tene danîn. Li her derê, bi her awahî gel, di nava xwe de dijminan derdixe mehkemeyê. Belê, Demirel dikare bibêje çend terorîst di şikeftan de mane, lê hema nikare reva mehmetçikên xwe ji ber wan "terorîstan" bisekinîne...**



# Almanyaya rûreş

## Yekda Welat

Li Kargeha Hitler a kevn çek li dijî têkoşîna gelê Kurd çêdibin.

Di rojname û televizyonên Almanyaya de van rojan hate diyarkirin ku kargeha Eurometaal li bajarê Nienburg li Almanyaya çekên taybetî ji bo leşkerên Tirkiyê çêdike. Ev kargeh di sala 1939 an de ji aliyê Hitlerê faşîst ve hatibû avakirin. Ev çekxaneyaya mezin, di sala 1939 an de li Almanyaya bû. Îro li wî cihê dîsa çek ji bo qirkirina gelan çêdibin.

Wezîrê Karên Derve yê yê Almanyaya Kinkel di gelek axaftinên xwe de digot: "Divê çekên Almanyaya li dijî gelê Kurd neyên bikaranîn."

Lê dewleta Tirk heta vê sersalê li hêviya 18 000 narincokên taybetî ye ku mirov pê bi hovîti tînin kuştin.

Ev çek li Eyaleta Saksoniya li bajarê Nienburg ji bo rawestandina tevgera serxwebûn û azadiyê hatine amadekirin.

Li bajarê Nienburg çekxaneyaya bi navê Karl ji aliyê Hitler ve hatiye avakirin û ev

çekxaneyaya çar qat di bin erdê de veşartî ye. Îro jî, li vê derê çekên tînin çêkirin. Çekxaneyaya îro bi her babetî jî, tê parastin û ne mirov û çûk dikarin herin nav wê erdimê (herêma) dora çekxaneyê.

Di vê çekxaneyê de Eurometaal ji bo dewleta Tirk çekên çêdike. Dewleta Tirk êdî nikare bi çekên xwe li dijî têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan bi ser keve.

Televizyona Almanyaya ARD, li sêr hikûmeta Demirel dibêje ku naxwaze pirs-girêka Kurdan bê-çek bigihîje encamê. Demirel dixwaze bi leşkeriyê li dijî Kurdan raweste û qirkirina li dijî gelê Kurd dom bike. ARD di hevpeyvîna xwe de wiha didomîne: "Ji ber ku leşkeriya Tirk li dijî gerilayên PKKê bi ser neketiye, dewleta Tirk taktîka xwe diguherîne."

Lord Avebury, ku bi xwe li Kurdistanê geriyaye û li Îngilistan (Îngiltere) Serokê Mafê Mirovan e, wiha li ser taktîka dewleta Tirk dibêje.

"Şirnex, guhertina taktîka leşkeriya Tirk diyar dika. Piştî ku di navbera gerîla û

leşkeriya Tirk de şer derdi-keve, leşkeriya Tirk êrişî sivîlan dike. Mirov alîkariya PKK'ê kiribe an jî alîkarî nekiribe, dîsa jî êrişî sivîlan dike û mirovan dikujê. Pîrgund û bajar hatine wêran-kin."

Hefteya derbasbûyî heye-teke (komek) leşkeriya Tirk hatiye Almanyaya û bûye "mêvanê" kargeha Eurometaal.

Bernfried Schulz, di berpirsiyariya Eurometaal de cihê xwe digire û dibêje ku: "Hiç agahî li ser amadekirina çekên ji bo Tirkiyê nîn e."

Lê Eurometaal eşkere di kovara leşkeriya Tirk de "Savunma ve Havacılık" bangeşîya bomba xwe ya taybetî dike.

Navê bombê:


M 483

18 km dûr difire

Di nav roketê de 88 narincokên biçûk (bombe) hene.

Di kovarê de hatiye nivîsandin ku ev roket ji bo mirovên ku kom dibin tê bikaranîn.

Mirovekî ku di Eurome-



Li Almanyaya ji bo leşkerên Tirk çekên taybetî çêdibin.

taal de kar dike wiha dibêje: "Dewleta Tirk dibêje girîng e ku hûn (Eurometaal) beriya sersalê wan bombeyan (raket) bi rê bikin. Ew (Tirkiyê) 18000 roketên M 483 dixwazin."

Ev bombe ku diteqe, 88 narincokên dinê ku di nav de amade ne, belav dibin û dîsa diteqin. Ku mirov wan bombeyan li dijî mirovên ku kombûne derxe, ev bombe dibê wek bombeke qirkirinê.

Me 15 000 roket çêkirine. Em rojê 416 bombeyan, dikarin çêbikin. Lewre jî em her roj zêdeyî saetên xwe kar dikin."

Li ser pîrsa ku dewleta Tirkiyê wê çî bike ji wan bombeyan, wiha dibêje: "Erê, ev bombe wê li dijî

gelê Kurd werin bikaranîn."

Karkerek ku naxwaze werre naskirin û di Eurometaal de kar dike wiha di axaftina xwe de dom dike: "Di mêjûya 17.11.92 an de, Tirkiyê ji me re halet bi rê kirin. Ev halet ji bo kera ne. Dewlata Tirk dixwaze bi qantiran wan bombeyan bibê serê çîyan. Bombeyek, 46 kîlo ye. Pakêt ji bo ku qantir wan bombeyan hilgirin."

Serokê Eurometaal Böhn, înkâr dike ku halet ji bo hilgirtina bombeyan li ser qantiran hatine Almanyaya.

Böhn dibêje, "Ez nizanîm ku ev bombe wê li Kurdistanê werin bikaranîn."

Dewleta Almanyaya dixwaze bi wan çekan qirkirina li Kurdistanê dom bike.

Bi wan çekan eşkere dibê ku dewleta Tirkiyê bê çare bûye û qirkirinê mezin amade dike. Ev bombeyan Almanyaya bi mebesta rawestandina serhildanan û komên gerîla hatine amadekirin.

Ev bûyer ji hezaran yek e ku hate diyarkirin. Împeryalizm her roj çekan û lojistik ji bo Tirkiyê bi rê dike. Dewletên Împeryalist baş dizanin ku, hêza wanî kevn dilêrize û rista wana giran nemaye. Lewre jî, îro dagirkerên Kurdistanê û Împeryalizm bi taybetî li ser têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê, PKK, radiwestin û diwaxazin şoreşa Rojhilata Navîn ku bi PKK xwe nû kiriye tune bikin. Lê dem hatiye guhartin. Gelê Kurd ne gelê kevn e. Gelê Kurd îro dixwaze bi avakirina Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê, îdara xwe dike destê xwe û doza serxwebûn û azadiyê pêşve bibe. Bombe, lojistik û her babetên teknîkî nikarin li dijî baweriya gel bi ser kevin.

## GOTÎN



Yaşar Kaya

### Zozan

**E**m zarokên çîyan in. Em rind dizanin deşt û zozan çî ne.

Li welatê me, dema buhar tê, hêdî hêdî berf ji erdê radibe, çîya û banî hêşîn dibin, berf dihele, ava çeman zêde dibin, li gelek cihan ev şaxên çeman digihîjin hev û dibin lehî. Lehî carna gund û avahiyan dide ber xwe û dibe.

Gundî jî, dest bi amadekariyên xwe yê derketina zozanan dikin. Piştî bi çend rojan, Aran germ dibe. Gundî tedarekên bar û koça xwe dikin. Konê reş derdixin û didin ber tavê. Ter, xurç, zîn û berzîn di çî rewşî de ne dinihêrin. Gêm û qentirmên hespa çawan in? Wê ji xalîçeyan, berran û kulavan kîjan herine zozan? Koz, çît û pergîr hene

yan tune ne? Li gişan dinihêrin, gişan amade û tekûz dikin.

Çend roj bi şûn ve, diçin li ser waran datînin. Li her zomekê, 30-40 konê reş û çadirên spî hene.

Li ser jiyana Kurd û Kurdistanê, gelek tişt hatine nivîsandin. Ev nivîsar giş li ser gundîtiyê û koçeriyê ne. Lê, li ser jiyana bajarên mezin kesî tiştêk nenivîsiye.

**Em zarokên çîyan in. Em rind dizanin deşt û zozan çî ne. Li welatê me, dema buhar tê, hêdî hêdî berf ji erdê radibe, çîya û banî hêşîn dibin, berf dihele, ava çeman zêde dibin, li gelek cihan ev şaxên çeman digihîjin hev û dibin lehî. Lehî carna gund û avahiyan dide ber xwe û dibe.**

RADYOYA KURDÎ

Min radyo vekir. Kîjan radyo bû ez pê nehisiyam. Lê belê spîker

deng dikir digot: "Xwişk û birayên ezîz. Ez ji Serhedê tîm, ji Agirî, ji Bazîdê, ji Tendurekê, ji Geliyê Zîlan tîm. Ji Dêrsimê, ji Serhildana Seyîd Rîza tîm, ji Koçgîrî, ji Serhildana Elîşêr tîm, ji Xînisê, ji Çapaxçûr (Bîngol)ê, Ji Siwêrekê, ji cem Şêx Seîdê kal tîm. Ez ji girtîgeha Diyarbekirê, ji nav 'agirê çaran', ji cem Mazlum Doğan tîm. Ji Cizîrê, ji Mezra Botan, ji çiyayên Kurdistanê, ji nav şehîdên gelê Kurd tîm. Gelî'hevalan!

War û cihên welatê me, îro navenda ceng e

Herkes bi me zane, xortê Kurd şêr e, piling e

Temaşe ke, rabe binêr, gazî û deng e

Hey, qehremanên mîletê Kurd rabin dereng e".

Min radyo girt.

Şev tarî bû. Cilkên baranê diketin sir belgan.

Şev tarî bû. Xew mîna mirinê bû. Baran dibarî ser belgên daran

Şev nerm bû, dengê baranê xweş bû. Ez ranezam.



## Her roj du 'Gündem'

Pesta (baski) dewletê ya li ser rojname û kovarên pêşverû, roj bi roj û bi awayên cur be cur berfirehtir didome. Rojnameya Özgür Gündem, ji hemûyan zêdetir nesibê xwe ji van pestan distîne. Geh nivîskar û nûçevanên wê tenê kuştin, geh jî erebeyên ku ji bo belavbûna wê tahsîs bûne tevî şofêrê wê ve tene şewitandin ku wehseteke wiha li tu derê dinyayê nehatiye dîtin.

Armanca van hemû kirinan, rêlibergirtin û bêdengkirina çapemeniya azad e. Dewlet naxwaze tu weşan objektîf bin û li derveyî îdeolojiya fermî (resmî) binivîsin û tiştina biweşînin. Ji ber vî awayî jî, zordestiya dewletê ya ku li ser van weşanan dibe, kêmbûn li aliyekî, roj bi roj hildipe-riker. Ji ber van zordestiyan, firotina van weşanan li her deverên Tirkiyê bi taybetî jî li herêmên ku di nav "sînorên rêveberiya taybetî" de dimînin, kêmbûn û ji astengiyên xelas nabin. Rojnameya Özgür Gündem, li ser vî yekê dest bi kampanyayekê kir û ev kampanya deng da. Li gorî vî divê jî îro û pê ve her kesên ku Gündem dixwînin li şûna yekê du heban bikirrin. Bi vî awayî hem xwendina Gündem û hem jî reklama wê, dê zêde bibin.

Ev kampanya bi beşdariya Serokê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal re, dest pê kir. Akın Birdal, ji hemû şaxên Komeleya Mafên Mirovan, ev daxwaz kir. "Maf û azadî, bi çapemeniyeke serbixwe tê temîn kirin. Piştî derbeya 12'ê Îlonê, riyên li ber mafstandinan hatin girtin; an jî astengiyên mezin li ber hatin danîn. Ji bo riyê li ber Gündemê vebe, çî jî destê me bê divê em tevî hev re bikin û bikin ku ev rojname tim bijî."

Bi rastî jî, jî îro pê ve domkirina jiyana rojnameya Özgür Gündem, bi piştgi-riyeke xurt a xwendevanan ve girêdayî ye.

# Kongreya ANAP'ê: Ne sîr e ne pîvaz e

Navenda Nûçeyan- Roja 30'ê Mijdarê, Kongreya ANAP'ê ya Awarte ya Duyemîn li dar ket. Di kongreyê de Serokatiya Mesut Yılmaz bi destekeke berbiçav careke din hate teyîdkirin. Kesên ku li hember Mesud Yılmaz rabûn tîk çûn û ji ANAP'ê îstifa kirin; li hêviyê ne ku gelek kesên din jî, ji ANAP'ê veqetin û ANAP bipelîşe.

Kongreya ANAP'ê, roja duşemê, li Enqerê, di salona sporê ya Selim Sırrı Tarcan de bi beşdariya ajawceyê (qerebalixekê) mezin bi hengaman û bi xire cîrê li dar ket. Di hilbijartina Serokatiya Dîwanê de Serokê ANAP'ê yê li ser kar Mesut Yılmaz, li hember Mehmet Keçeciler, ji 994 rayan 652 ray stand.


Di hilbijartina ji bo guhertina ristnameyê de jî Mesut Yılmaz, bi ferqeke mezin li dijî Mehmet Keçeciler û hevalên wî bi ser ket.

Hina hilbijartin û programa kongreyê dewam dikir, raqîbên Mesut Yılmaz, salona Selim Sırrı Tarcan terk kirin. Dora rojê Mehmet Keçeciler û 15 havalên xwe jî bo ku damezrandina partiyeke nû îstafa kirin û tîkiliyên xwe ji ANAP'ê birrin. Roja 2'ê Kanûnê jî, 58 mebûsên ANAP'ê yên kevn, dev ji partiya xwe berdan û gihîştin tîkçûyiyên kongreyê.

Ev kesên tîkçûyî wek zîlamên Serokê Komara Tirk Turgut Özal, tîk naskirin û niha jî rêzdarî û alîgiriya xwe ya ji bo Özal venaşêrin. Mehmet Keçeciler û 15 hevalên wî yên Özalgir di daxuyaniya xwe de, jî bo Özal dîtinên xwe wiha der pêş kirin:

"Birêz Özal, liderê me ye, kengê bixwaze vegere nav siyasetê, cihê wî li ser serê me heye."

Ji xeynî Mehmet Keçeciler, 15 mebûsên îstifakîrî ev in: Y. Akbulut, H. Doğan, Y. B. Ö-



Kongreya ANAP'ê dawî li hesabên Turgut Özal yê li ser partiyê anî. Mesut Yılmaz, tevî MHP vanên kevn partî kire destê xwe.

zal, H. Şıvgın, Ercüment Konukman, T. Toskay, Leyla Yeniyay Köselioğlu, İbrahim Esat Canan, Osman Ceylan, Gaffar Yakın.

Her çiqas tevliheviyeke pîrr mezin di nav ANAP'ê de çêdike û bi awayên hişk û dijwar li dijî hev radibin jî, ji alî siyaset û îdeolojiyê ve ferqeke mezin di

navbera kesên îstifakîrî û hevalbendên Mesut Yılmaz de tunc ye.

Hem Mesut Yılmaz û hevalên xwe, hem jî aliyê din, bi muhefzakarî û nîjadperestiya xwe ve tîk naskirin. Lê dibe ku Mesud Yılmaz, bi nîjadperestiya xwe jî aliyê din xerabtir be. Bi kurtî ne sîr e ne pîvaz e.

## PEN'a Navneteweyî kongreya xwe bi 'Siyabend û Xecê' vekir

Navenda Nûçeyan- PEN'a Navneteweyî, Kongreya xwe ya 58'an bi şîrkatiya PEN'a Brezilya, li bajarê Rio de Janeiro li dar xist û kongre, bi filmê Siyabend û Xecê vebû.

Di 29'ê Mijdarê de, li salona kongreyê ya Otel Othan a li Capacabana, piştî peyvîna rayedarê PEN'a Brezilya Antonio Olint û Serokê PEN'a Kurd Hüseyin Erdem, film hate nîşandan û ji alî temaşevanan ve gelek hate ecibandin.

Civînên Kongreya 58'an a PEN'a Navneteweyî, bi beşdarbûna gelek kesên navdar, rûçiknas û nivîskar ve didome. Di nava wan kesan de, Jorge Amado, Vaclav Havel, Nadîne Gordîmer, Mário Vargas, Stephan Hermilîn, Francis King jî hene.

Îsal dê Serokê PEN'a Kurd Hüseyin Erdem, civîna Komîteya Aştiyê idare bike.

Her wiha "Komîteya Nivîskarên Girtî", prodûktorê filmê Siyabend û Xecê Senar Turgut, dawetî civîna xwe kir; daku demên xwe yên girtibûnê ji wan re bîne zimên.

Senar Turgut, di dema kêşana filmê Siyabend û Xecê de hatibû girtin û ji bo nekêşîna film jî, gelek dijwarî û astengî li pêşîya wan hatibû danîn. Heta qedandina kêşana film, pest û pêkutîya dewleta Tirk li ser serê hemû xebatkarên filmê Siyabend û Xecê kêmbûn.

Ji alî din ve Selim Çürükkaya jî, ji bo îşkenceya li Tirkiyê; tahde û pêkutîya lê û rewşa ronakbîrên Kurd bîne zimên, PEN'a Navneteweyî ew dawetî bajarê Rio de Janeiro kirin.

Selim Çürükkaya demêke

dirêj di zindananê dewleta Tirk a mêtîngehkar de maye û gelek îşkence, lêdan, heqaret, tahde lê bûye û herwiha jiyana zindanan bi çavên xwe dîtiye. Pirtûkek li ser rewşa zindana Amedê bi navê "12 Eylül Karanlığında Diyarba-

kir Şafağı" (Di Tariya 12 Îlonê de Berbanga Amedê) nivîsiye.

Beşek ji filmê Siyabend û Xecê ku serlistikvanên Tirk, Tarkan Akan û Mine Çayiroğlu dileyîzin, di televizyona Brezilya qanala yekemîn de hate nîşandan.



Ji filmê Siyabend û Xecê, Mine Çayiroğlu di rola Xecê de.



# Dewlemendiyên Kurdistanê û çar 'zêlû' yên xwînmijok

**Enerjiya elektrîkê ya bi hêza ava Kurdistanê tete meydanê, çerxên fabriqeyên industriyên bajarên metropolê didin gerandin. Enerjiya ji bermayî jî, ji bo welatên cîran tete firotin û Kurdistan jî bi tevayî di tariyê de tete hiştin.**

## Bavê Berzan

Ev bi kêmanî deh sal bûn, ku dagirkeriya Tirk, projeya herifandin û bikaranîna dewlemendiyên Kurdistanê- GAP'ê (Güneydoğu Anadolu Projesi) gav bi gav, pêş de biribû. Eger ev karê pêşvebirinê, weke planbûyî bête ajotin, ewê projeya GAP'ê, di encamê de, di nava van çend salên nêzik de, here serî û bendava dagirkeran, Atatürk Barajî jî, weke bendavên din li ser axa Kurdistanê (Devegeçidi, Keban, Karakaya) herifandin û bikaranîna siruşt û xwezayî Kurdistanê pêş ve bibe.

Enerjiya elektrîkê ya bi hêza ava Kurdistanê tete meydanê, çerxên fabriqeyên industriyên bajarên metropolê didin gerandin. Enerjiya ji bermayî jî, ji bo welatên cîran tete firotin û Kurdistan jî bi tevayî di tariyê de tete hiştin. Dema dagirkeriya Tirk propagandaya GAP'ê dikin, dibêjin "Bölgenin en temel sorunlarını kökten çözecek, bölgede çağın en büyük sosyal ve ekonomik kalkınma hamlesini gerçekleştirecek bir proje." Anku projeya GAP'ê, dê pirs û gelşên herî bingehîn ên herêmê, ji binî ve çareser bike û ewê li herêmê, pêşveçûnên civakî û aboriya herî mezin a serdemê bi cih bîne! Bi vê yekê jî baş diyar dibe ku ramyariya dagirkeriya Tirk, xwe bi tenê dispêre derew û demagojiyê. Eger mebesta GAP'ê veristin û çareserkirina gelş û pirsên herêmê be, çima ji niha ve hemû enerjîya ji bendavên dinê bi dest dikeve, diçe industriyên li metropolê? Ev tişt, mîna vê neheqî û bêdadiyê ye, ku Tirkiye, hemû baxçe û medrebên xwe, bi ava Kurdistanê av dike û dilopek avê, ava ji siruşt û xwezayî Kurdistanê dertê, nahêle dilopek li ser axa Kurdistanê werbe. Paşê jî dibêje "Ev bendavên din têr nakin, emê GAP'ê pêşve bibin daku pê gelşên Kurdistanê çareser bikin!" Kî bi vê virrê bawer dike? Ma ne diyar e ku bendavên dinê têrî ekonomiya Tirkiyê nake û Tirkiye bi GAP'ê dixwaze bendav li ser çavkaniya enerjîya herî mezin, li ser ava

zad û danên erdên ve herêma bi bereket, weke li Amerîkayê, ji destê dewletê ve bête organîzekirin û mebest, ji dewletê re hiştina sûd û kelkeke bi hejmareke astronomîkî ye.

Petrol li Batmanê derdikeve, bi boriyan dikêşin dibin Îskenderûnê, ji wir jî İzmir-Aliaxayê. Komira Şirnexê, cewher û madenên cihên mayî ji diçe fabriqeyên metropolê.

Ji pêşemîn dewlemendiyên xwezayî Kurdistanê, petrol li başûrê Kurdistanê bi tundî li herêmê Kerkûkê dertê. Di destpêka vê sed salê de, kapitalîzma Ewropî, ji bo bidestxistina vê çavkaniyê, Împaratoriya nexweş dagir kir û paşî jî, ji xwe re du heres û notirvanekî bi cih kir û dû re gewdeya xwe ji herêmê kişand. Heresên Iraq û Sûriyê, herestiya xwe bi liyaqat û peyman, ji wan re heta îro jî bi cih dihênin. Bi dewlemendiyên ji Kurdistanê, gund û bajarên xwe yên li çola sor, kirine wihayên luksê û Kurdistanê Iraq û Sûriyê jî, li ber wan, çol û beyar mane. Mijokdariya dema Şahînsahan û Ayetullahan li ser xwezayî rojhilata Kurdistanê, mîna tariya serdema naverast tund û kesîf e. Lê belê, roja rizgarbûna dagirgehan ji bin nîrên bindes-

tiyê pîrr nêzik bûye. Berî ku em xwe amadeyê rabûna Kurdistanê mezin bikin, em piçekî berê xwe bidin dewlemendiyên li dîroka Kurdistanê.

Di dîroka mirovayetiye de, şopa çandin û çinîne, di dorhêlên naverasta her du avên Dicle û Feratê de, heta roja îroyîn, ji me re mîna şopêke pîrr baş xuya û kûr, maye. Ev şûnewarê dîrokî, yek ji wan cihên guzîde ye, ku cara yekemîn mirovan, li wê derê, dev ji jiyana şikeftan berdan û li ew deşt û newalên vî şûnewarê dîrokî, komeleyên xwe yên pêşemîn ava kirine.

Eger mirovayeti, rojekê êdî berfirehtir û êdî kûrtir bal û dêhna xwe bide ve domanê, sedemên gelek nakokî û dijberiyên li herêmê, ewê di vê rewşa wê ya awarteyî de bibîne. Çawan erd û pirêzên zad û danê deşt û newalên Mezopotamyayê bûbûn sedema cengên qewmên antikî, îro ev ceng her ji ber vê sedemê dîsa berdewam e. Tenê çek û pûsatên di destê mirovan de guherîne. Ne rawişt û cirra wan. Tîr û kevan, şûr û mertal şûna xwe ji tanq û top û firokeyan re hiştine.

Senofon, di vegera xwe de, rîya wî ji welatê Kardûkan der-

bas dibû. Bi deh hezaran serbazên wî pê re bûn. Her çend mebesta Senofon, ne mayîna li Kurdistanê jî bû, dîsa bi aşî ji Kurdistanê derbas nebû. Kardûkên sekban, bi wan rim û kevkehiyên xwe, bi wan kevanan ku tîrên wan bi lingan dihatin kişandin û ji alikî laşê serbazên Senofon diketin hundir û ji aliyê din ve dihatin der, derbasbûna leşkerê Senofon ji ser axa Kurdistanê wisa dijwar kiribûn, ku weke ji dojhê derbas dibûn, ne ji Kurdistanê...

Hatina êl û qewmên Tirkan, bi Kurdistanê di çi kertê de weke derbasbûna Senofon dramatik bûye, îro em baş pê nizanin. Em bawer in ku ev nezaniya me ji ber fanatîzma di ola îslamê de ye. Lewre bi navê "asarê ehl-i kuffar", bi hezaran belge û spartekên dîrokanên vakanivîsên wê serdemê û herî wê serdemê, hatine şewitandin. Lê belê me gelek divê ku em, dem bi dem û keli bi keli derînin meydanê ku kerta bergirî û berxwedana me ya li dijî êl û qewmên Tirkan sed sala 11'ê emîn çi bûye? Divê ji wê rojê heta ve rojê, dewlemendiyên ser û binê xwezayî Kurdistanê, wisa bi hêsani neketibe destên van her çar "zêlû" yên xwînmijok.



Amed û Dicle: Di hezna welatekî serbixwe de ne.





Gelê ku li ber zilmê serî ditewîne,  
kefî û kole ye. Ji koleyan nayê  
hezkirin.

A. Öcalan

# Bûk û bûka Kurdistan

Îro, keçikên Kurd êdî ji welatê xwe re dibine bûk. Ên ku ji bo xebata şoreşa Kurdistanê nakevin rê, gel li wan tiranan dike (gel kenê xwe bi wan dike). Berî demekê, ez li mala hevalê xwe bûm. Li wê malê dê bûkek siwar bibûya. Ji bo dawetê amadekarî dikirin. Bûkê cihêzê xwe rast dikir û xwarziya bûkê jî alîkariya wê dikir. Lê, di ber vê alîkariyê re jî pirr kenê xwe bi xaltiya xwe dikir. Ji bûkê re digot: "Ev çi ye? Ma şerm nîn e ji te re! Îro li welat şer dibe tu bi pey zewacê ketiyî!"

Pirr tişt ji bûkê re gotin. Gava ku cihêzê bûkê hildida û datanî, her eşyayekî bi hêza milê xwe davête nav odê û bela wela dikir û digot: "Ez cihêzê te naxim boxçê. Ezê giş bi kaxizên rojnameyan bipêçim (bialînim). Em cihêzê te bi rojnameyên me (Welat, Yeni Ülke, Gündem) jî napêçin, emê cihêzê te bi rojnameyên Türkiye, Tan, Zaman, Hürriyet, Sabah û



hwd. bialînin." Li ser vê, diya bûkê li firaq û folên bûkê nihêrî û wiha got: "Xwezî ez niha ciwan bûma û bizewiciyama." Xwarziya bûkê jî li diya bûkê nihêrî û jê re wiha got: "Tu du caran zewiciyî, ma têra te nekiriye?! Tu dixwazî em te dîsa bidin mêr!"

Wê gavê, pîrê li ser başbûna zewacê hin tişt jî gotin. Keçika biçûk dîsa bersiv dayê: Hûn ji bo xwe, ji bo welatê xwe xebitîbûna,

wê me jî, îro rehet bikira. Lê hûn dibêjin mele wiha gotiye, şêx wiha gotiye û hwd. Îro şêx bûne rêx, ez mîna we nafikirim" Lê dîsa jî dilê keçika biçûk rehet nebû, rabû cihêzê bûkê, parçeyên mezin (legan, teşt, beroş, kotik... û hwd.) çi kete destê wê avête nav odê û bela wela kir. Ji ber vê yekê ez pirr fikirîm û pê bawer bûm ku civaka me pirr hişyar bûye. Gelê me girîngiya têkoşinê êdî baş fêm dike.

Paşî, min ji keçika biçûk pirsî ka ewê çi bike? Wê ji min re got: "Ezê di demê kurt de bibim bûka Kurdistanê. Emê li Kurdistanê daweta xwe bikin. Îro namûsa me welatê me ye. Emê cihêzê bûkê bi vî awayî bi rojnameyên TC'ê bialînin. Gava em ji Kurdistanê re bibin bûk, gelê me, wê me bi ala Kurdistanê, bi kesê û sorê û zêrê ve siwar bike. Emê bi vî awayî bibine xwedî ax.

Min dixwest, bûkên ku bi mêran re haziriya zewacê dikin û ji bo vê cihêzê xwe amade dikin, ew cihêz biavêtana meydana û agir pê ve danîna.

Bi vî awayî, wê agirê Newrozê geştir bûbûya. Cihêzê me çek û pirtûk e."

Kulîlka Hezaran

## ATEŞ HIRSIZI

Kovara Siyasî ya Mehane

"Ne hirç û hov in  
em xweş mirov in"

Ji NAVNÎŞANA JÊR BIXWAZINI...

KLODFARER CAD.  
DR. ŞEVKİ BEY SK. NO:4/2  
SULTANAHMET - İSTANBUL

DI NÊZİK DE DERDIKEVE

## TÎR

Musa Anter



### Mamo Can

"Xwedêwo! Êdî bes e, lo!"

Lo, Mamo can, lo!

Mûsawo kal, Musayê zal

Mûsayê mam, Apo can

Dehakê çarserî bi qurban

Apê ma gaza çiyayên welatê ma (1)

Agirî, Cûdî, Sîpanê Xelatê ma

Ax sar o, jê hez nakim

Axa Mûsan germ e; şoreş tê de dimeyin

Ez dikim herme...

Wekî dinê, dîwarê bin lingê min î nerm e

Şan û rûmeta Dehakê çarserî tenê term e

Kalemergo, kalo can

Cotek, du cot... pirr cot li pê te man

Cotê berxwedanê te ajot

Cotên mayîn:

Berek kêr e, birrek tiveng e

Berek sêr e, birrek ceng e

Porê te tê de reng da, cegerit rast pereng e

Ez dikim herme...

Wekî dinê, dîwarê bin lingê min î nerm e

Hunerê Dehakê çarserî tenê term e

Ê hevalbendên wan şit dotine, heya çerm e (2)

Mûsawo kal, Mûsawo zal

Gelmîrî "nêrde", Dehak "nêrde" (3)

Heyf! Rustemê me li ku!

Mûsawo kal, temen heftê û çar sal

Mûsawo bê çinar, guneh ê neyar

Mûsayên bê çinar bipirse ji Cûdî: bê jimar

1992: saleka Çelberfê bû

Mirov kom bûbûn, qulîlîbûn

Bask û qanadên bêçinaran qerimîbûn

Ardû bol-estû, bi baran bû

Heste venediket, çîqek jê kêmbû

Xamê te bi tîn bû

Apê Mûsa, bavê kal

Şêr bi lepê xwe, Kurd û Tuwarêg bi destê xwe

(4)

Mûsawo nebez (5)

Çemên Bakurr diherikin

Leşkerê Tirko te direvînine Zivingê bi lez

Çemên Bakurr xuşe xuş in

ARGK pê re dileze; nîşana armancê girtiye

Çara leşkerê Tirko kevz e

Zivingê, xwîngê

Çi şan û rûmet e, birayê te

Apê Mûsa, pîtolê Kurd, bûye mêvanê te (6)

1. Gaz: Serê çiyê

2. Şit: Şîr

3. Gelmîrî: Demokrasî

4. Tuwarêg: Miletêkî ji qabilên Afrîqa ye. Îro, ketine bindestên reşikên ku doh kole bûn û Ereben ku doh bindest bûn. Koledarên Ewrûpî welatê wan jî wekî Kurdistanê li Nîcêrê, Malî, Cezayîrê û Lîbyayê dane parkirin. Her roj, ji wan jî wekî Kurdan tene kuştin, lê kesek dengê wan nabe xwe.

5. Nebez: Ê ku li ber xwe dide û ji cihê xwe nalive.

6. Pîtol: Filosof

Mamo Cûmî



# HEP bi ku ve diçe?

Navenda Nûçeyan- Partiya Keda Gel (HEP), ji roja avakirina xwe ve heta îro, tevî hemû rêlibergirtin û astengiyên, tevî pest û zora dewletê ya li ser wan, xizmetên girîng pêk anî û ji bo çareserkirina pirsgerêka Kurdî gavên heja bi pêş ve avêt.

Gelê Kurd jî, bi hêviya bilêvkirina pirsên xwe di meclîsê û qada navneteweyî de, mebusên xwe hilbijart û şande meclîsê. Di hilbijartina 1991 an de, li herêmên ku PKG berendam nişan da, %70 ray stand. Ev jî rûmetdayîna gelê Kurd a ji PKG'ê re bû.

Mebûsên Kurd, hê ji roja ewil ve, ji bo dewletê bûn asteng. Roja sondxwarinê tewra (helwesta) mebusên Kurd, bû sedemê gelemşê û bûyerên girîng. Dewlet, bi hemû hêzên xwe ve çû ser van mebusan û çapemeniya Tirk jî, li hember wan dest bi kampanyayên durû kirin.

Ev kampanya heta îro didomin. Ji çend rojan carek li hember PKG'ê, bi destê MIT'ê provakasyon li dar dikevin û ew li

hember raya Tirk tewandar dikin.

## ŞERÊ TAYBETÎ Û TEWRA PKG'Ê

Ev demeke dirêj e ku dewlet, ji bo tunekirina serhildana Kurd, riyek daye ber xwe. Ev rê, şerê taybetî ye. Ev şer, ji alî organizasyoneke dewletê ve tê meşandin. Navê wê "Daîreya Şerê Taybetî" ye. Di nav vê organizasyonê de, beşên cure cure hene. Şerê psîkolojîk, şebekeyên cîniyetan, xebatên asimilasyonê û hwd. Hemû ji alî vê organizasyonê ve tên meşandin.

Partiya Keda Gel jî, ji hemû cureyên vî şerî nesibê xwe distîne. Bi dehan endamên vê partiyê, ji alî kontrayan ve hatin kuştin, ji bo di nav PKK û PKG'ê de, tēkili bēn îspatkirin, bi dhan provakasyon li dar ketin û hwd.

Li vê derê, tiştê ku gere bē nirxandin, li hember van kirinan tewra PKG'ê ye. PKG bi her êrişêke dewletê re, gavekî bi paş ve avêt. Nikaribû li gor vê rewşa nû, politikayên li gor

demê derxe holê û xwe biparêze. Her gavavêtineke wan ê bi paş ve, bû sedemê êrişêke nû. Di dawî de, ew tēkiliya xurt a di nav PKG'ê û gelê Kurd de, îro qut bûye. Îro gel, bi çavek din li Partiya Keda Gel dinêre û rexneyên giran li wan digire.

PKG, êdî nikare xwe wek nûnerê gelê Kurd bibîne. Jixwe

gel jî, êdî weke berê bi çavê nûnerên xwe li wan nanêre. Ji bo PKG ji nû ve, baweriya gel bi xwe bîne, divê politikayên nû û hemdem bimeşîne û xwe li gor wan şertên nû bi rê bixe.

Li ser vê bîpaşketina PKG'ê û rewşa îro, me bi telefonê, bi Alîkarê Serokê Giştî Ibrahim İncedursun re axaftinek kir û

ditinên wan girtin.

## BER BI KU VE?

Pirsên me, bi giştî li ser, greva birçibûnê ya ku 18 mebusên PKG'ê li meclîsê li dar xistin û beyanên wan yê li ser hevditina bi PKK'ê re û encama vê hevditîne bûn. Ibrahim İncedursun, li ser pîrsa me, greva birçibûnê wiha nirxand: "Dewlet hemû riyên aştîyê girtiye. Îro dewlet şerek bi giştî dimeşîne û ji bo lihevhatinê tu rê venake. Partiya me jî, ji bo mesajek bide raya giştî û qada navneteweyî, grevêke wiha li dar xist. Grevê me gihiştê armanca xwe û bi serfirazî xelas bû." Me jî Ibrahim İncedursun pîrskir ku dê ji îro pê ve çî bikin. Lê bi rastî ji bilî politikayên ku heta niha ceribandine tu tiştêkî nû di bersivên wî de xuya nekirin.

Pîrsa me ya duyemîn, li ser hevditina bi PKK'ê re bû. Weke tê zanîn, demeke berê beyanên rêvebirên PKG (HEP)ê, di rojnemayan de derketin. Digotin: "Em dê ji bo lihevhatinê, di nav PKK'ê û dewletê de, navbeynkarî bikin û em dê pêşî herin bi PKK'ê re biaxivin." Lê dawî tu deng û his ji wan derneketibû.

Di rastiya xwe de, pêşî dewlet tiştêkî wiha dabû ber xwe û ji bo bikaranîna wê jî, li ser navê "Hürriyet Produksiyon" wezîfe dabû Uğur Dündar û ekîba wî. "Hürriyet Produksiyon" bi tek-lîfeke wiha diçe cem PKG'ê û ew jî qebûl dikin. Dawî jî, beyan didin rojnemayan ku, "Em jî, ji bo lihevhatinê, ji wezîfeyêke wiha re amade ne." Lê, paşî dewlet jî vê biryara xwe vedigerê û PKG jî, li navê dimîne. Ibrahim İncedursun, di vê mijarê de wiha got: "Ew (Hürriyet Produksiyon) raste rast li ser navê dewletê ve teklîfê jî me re anîn. Me jî qebûl kir. Lewre ji bo aştîyê dê bibûna gaveke girîng. Lê di nav wan de jî, du-bendî hebû û hinek ji wan li hember vî tiştî derketin. Bi destpêkirina şerê li Kurdistanê Başûr re jî, bi temamî dev ji vê projeyê berdan. Lê ev tişt di rojê me de ye û em dixwazin pêk binin." Lê pîrsa me ya, "Ka hûn ji bo vê pêkanîne çî dikin? Li hewa û bê bersiv ma."

Tiştê ku xuya dibe, PKG îro nikare politikayên nû derxe holê û ji rastiya gel dûr dikeve. Lê îro jî dikarin xwe biguherînin û baweriya gel ji nû ve kar bikin. Ji bo vê jî, divê PKG, xwe ji serî ve binirxîne û vê pîrsê jî xwe bike: "Em ber bi ku ve diçin?"

## Endamê HEP'a Antalya hate kuştin

Endamê Heyeta Rêveberiya Bajarê Antalya yê Partiya Keda Gel (HEP) diranker İrdis Çelik ji hêla kesên "tarî" ve hate kuştin.

Li gor daxuyaniya Navenda Giştî ya Partiya Keda Gel, heta niha 28 rêvebirên wan ji alî kontrgerîla ve hatine kuştin. Dan xuyan ku İdris Çelik jî, ji alî kontrgerîla ve hatiye kuştin û tahde û pêkutiyên ku li wan tene kirin bi van gotinan anîn ziman: "Bi vê cîniyetê dibe 28 rêvebirên me ku ji alî kontrgerîla ve tên kuştin. Bêpirsiyarên van "failên meçhûl" iktidara îro bi xwe ye. Bila bê zanîn ku bi van cure cîniyetan nikarin me ji doz û tēkoşîna mafên mirov û demokrasîyê dûr bixînin."

## Bêpirsiyarî û sersarî

Her wezîfe û kar xwedî mesûliyetek in. Girîngiya wezîfeyêkê jî, bi giraniya mesûliyetê wê ve girêdahî ye. Wezîfeya mirov, çiqas zêde kesan eleqedar bike, ew çend girîng e û ewçend mesûliyetê wê giran e.

Ji ber vê yekê girîngî û mesûliyetê her wezîfeyê jî ne yek e.

Mebûsî wezîfeyek ji yê herî girîng e û ji aliyê mesûliyetê ve jî, bi gelek wezîfeyan re nayê muqayesekirin. Mesûliyet û girîngiya wezîfeya mebusiyê, ji ber aliyê wê ye civakî tê. Gotin û helwesteke mebusêkî (ê) bi milyonan kesan eleqedar dike. Di çareserkirina pirsên civakî de, ev wezîfe xwedî roleke girîng e. Li aliyê din, xeta û nebaşîya mebusêkî (ê) dikare bibe sebebê xemgîni û serêşiyên civakî. Ji ber vê yekê, ev wezîfe bi qasî mesûliyet û girîngiya xwe cidîyet, bawerî û helwestkariyê (hesasiyê) jî dixwaze.

Lazim e mirov hinek li ser mebusên HEP'ê bisekine, ka çiqas li vê bêpirsiyariya xwe xwedî derdikevin. Ev mebusên ku, bi rayên gelê Kurd îro di Meclîsa Tirkîyê de cih girtine, çiqas divêtiyên ve wezîfeya xwe tînin cih.

Dema HEP derkete meydanê, ew bûbû heft sal ku gelê Kurd di nav tēkoşîne de bû.

HEP bi avantajêke mezin dest bi jiyana xwe ya politik kir, ji ber ku dema dest avête siyasetê; hingê li Kurdistanê bi milyonan welatparêz hebûn û giş bi dil û can ji bo her cure fedekariyê amade bûn. Ji ber vê yekê HEP

bi, siyaseteke cidî û rast dikaribû gelek tiştên girîng pêk bîne.

Bes, HEP li ser vê mîrasya xurt rûnişt û zêde bi vî karî ve daneket û rola xwe bi temamî neanî cih.

Helbet, HEP leqayî gelek asteng û tengasiyan hat. Di şertên pîr dijwar de hin gavên girîng jî avêtin û di pêvajoya xebatên xwe de, pîr zor û tade dîtin. Hejmarek endam û bêpirsiyarên wê bi êrişên kontrgerîla ve birindar bûn, hatin kuştin.

Lê, herçiqas ev xebatên HEP'ê yê bi sînor û dijwariya şertên ku HEP tê de ye neye înkarkirin jî, HEP bi qasî mesûliyetê wezîfeya xwe gavên girîng neavetine û xebatên xwe gelek caran sist girtine û hemû hêz û helwestkariya pêwîst li rola xwe xwedî derneketiye.

Îro, ji herdem zehfîr şerê çekdarî û tēkoşîna neteweyî didome. Şerê çekdarî derfet û îmkânên mezin di warên legal de vekirine.

Di vê rewşê de jî, ger di warê legal de komek rojname an jî rêxistin û mirovên welatparêz bi ser nekevin, ji ber kêmasî, xwenûnenikirin, tembêlî û sersariyê ye. Heke HEP jî, îro bi ser nakeve û ji gel dûr dikeve êdî zehf ji sistî, tembêlî û sersariyê ye. Gelê Kurd, hê jî bi temamî hêviya xwe ji HEP'ê nebiriye. Ji ber vê yekê karên girîng hê jî li benda HEP'ê ne.

## ŞERÊ ANSİKLOPEDIYAN

Rekabeta ansîklopediyana a di navbera rojnemayên Hürriyet, Sabah û

Milliyet de parçeyekî girîng ji şerê "Mucadela Topyekûn" e.

Ev ji salekê zêdetir e ku, rojnemayên Tirk li Kurdistanê pîr hindik tēn firotin, heta li hinek deverên Kurdistanê qet nayên firotin, kes wan naxwîne.

Dema rola ku çapemeniya Tirk di parastina dewleta Tirk de li ber çav bê girtin, hingê girîngiya nefirota rojnemayên Tirk li Kurdistanê, wê baş bê famkirin. Pêwîst nake ku em zêde li ser rola wê bisekinin, gotina İsmail Beşikçi "Çapemeniya Tirk şaxekî MIT'ê ye" bes e.

Ev şaxê MIT'ê da ku careke din bikeve Kurdistanê û mejiyê gelê Kurd tevlîhev bike, xwe dixwe zêde mezin û ansîklopediyana dide xwendevanên xwe. Demîrel û wezîrên dewletê giş di televizyonan de wek reklamvanan reklama van ansîklopediyana dikin.

Bê şik û bê guman bi belavkirina ansîklopediyana, ev her sê rojname tu karê aborî bi dest naxin, berevajî, wê zirarekî mezin bikin.

Dîsa bê şik û bê guman, karê armanca wan ew e ku, xwe di Kurdistanê de dîsa bidin xwendin. Helbet ev zirarê wan jî, wê ji aliyê dewletê ve bê telfîkirin. Hem zirarê jî bikin tiştêke nabe, ji ber ew xwe û dewletê yek dibînin.

Gelê Kurd divê bi vê leyîstîka dewletê nexape. Em, ji xwe bawer in ku, gelê Kurd ne hewcê ansîklopediyên wan e. Gelê Kurd ansîklopediyên xwe nas dike.



# Niha dor a hilbijartina mebûsan e!

Swêd, Welat- Qonaxa yekemîn a hilbijartinên Meclîsa Neteweyî li pey me ma, bi gotinên din bû tarîx.

Şop û tesîrên hilbijartinê niha gava du hefte di ser hilbijartinê re derbas dibin hê ji dewam dikin û di kovar û rojnameyên me de, di nav xelkê welatê me de, li hundir û li derve ev şop û tesîr çendî kûr in têne ditin.

Li Ewropa qala 700-800 hezar Kurdî dibe. Çendê vê hejmarê balix bûne û xwediyê mafê dengdanê ne û çendê wê di bin 18 an re ne, cihê lêkolîn û lêhûrbûnê ye.

Ji temamê Kurdên li Ewropa nêzîkî 90 hezar Kurdî, ku temenê wan di ser 18 an re ye, çûye ser sindoqan û dengên xwe dane Meclîsa Neteweyî. Ev reqem mezin e û di serî %50 re ye.

Şik û guman tê de tune ku salên li pêşiya me de beşdariya hilbijartinê xurttir bibe û kesên ku dê dengê xwe bîdin, ji îro pîr zêdetir bin. Qonaxa yekemîn, bû

tarîx û em niha li duyemîn qonax û pêpeloka Meclîsa Neteweyî nêzîk dibin.

19 û 20'ê meha em tê de ne, dê li bajarê Frankfurtê 154 delegyên Meclîsa Neteweyî bicivin û di nav xwe de 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî hilbijêrin. Amadehiyên civîn û konferansa Frankfurtê li dar in. Delege, propaganda xwe dikin û ji bo bence hilbijartinê dixebitin. Propaganda vê qonaxê ji ya qonaxa yekemîn cihê ye, zêdetir bi telefon û nameyan e. Delege hevûdu pîroz dikin, meylên hev saxtî dikin û niyetên xwe ji bo konferansê ji hevûdu re eşkere dikin.

20, 21 û 22'ê meha Mijdarê li pey me man û niha ji bala giş Kurdên li derveyê welat xwe hêdi hêdi ber bi 19 û 20'ê meha Kanûnê ve dadigerîne. Herkes bi heyecan e û çavnerê Konferansa Frankfurtê ye. Gava yekemîn Mebûsên Meclîsa Neteweyî di dîroka Kurdistanê de li derveyê welat dê kî bin? Herkes meroq dike.



Li Ewropa sed hezar Kurd beşdarî hilbijartinê bûbûn.

Osman Öcalan:

## 'Çare hinekî din têkoşîn e'

Navenda Nûçeyan- Kumandarekî ji yê girîngtirin ên PKK'ê Osman Öcalan, li ser çareserkirina pirsgerê Kurdî dîtînen xwe ji rojnamevanê rojnameya Özgür Gündemê Raif Türk re, anîn zîman.

Li ser pirsê, "Çareya pirsgerê Kurdî çi ye? " Osman Öcalan wiha bersiv da: "Çare hinekî din têkoşîn e."

Osman Öcalan dîtînen xwe wiha anîn zîman û rewşa dawî bi kurtî wiha nîrxand: "Pêvajoya çareserkirina dest pê kiriyê. Şekle pêşveçûna têkoşîna me ye, ya ku vê rewşê zû an jî hêdi dike.

Êdi ew şertên salên heştêyan ku tê de gelê Kurd dihate înkarkirin, neman.

Êdi ne gelê Kurd serî ditewîne, ne jî dewleta Tirk dikare serî bi gelê Kurd bide tawandin û serdestiya xwe bidomîne.

Dewlet jî di zanîna vê rewşê de ye, gelê me jî. Her du alî, wê têkoşînê bidomînin. Ji aliyekî ve, ji bo kontrolkirina pêşveçûnan dewlet dixwaze bi reforman, gelê me jî bi pêşengiya partiya me dixwaze bi têkoşînê vê pîrsê hal bike. Ev pêvajoya dikare wek pêvajoya çareserkirina jî bê nîrxandin.

Têkoşîna me îro êdi ne ya birreke piçûk e. Hemû birên neteweya me di nav têkoşînê de cih girtine. Ew kesên ku berê ji bo dewleta Tirk piştgirî dikirin, îro

beşdarê têkoşîna me ya neteweyî dibin.

Ji bo çareserkirina, pêdivî hinekî din bi têkoşînê heye. Dewlet dixwaze bi çend reformên bi sînor pêşiyê li têkoşînê bigre. Li hember wan listikên dewletê, divê em têkoşînê bajon.

Weke ku tê zanîn, di programa hikûmeta Demirel û İnönü û protokola koalîsyona wan de mafên mirovan cihê girîng digirt.

Ewropa jî, li malzemeyê vê vitrînê nêrî û heta salekê muhlet da vê hikûmetê. Hikûmata koalîsyonê got ku we dikaribe mafên mirovan pêk bîne lê lazim ç pêşî PKK'ê jî holê rake. Ji bo vê jî Ewropa salek muhlet da vê hikûmetê.

Ji bo ku hikûmeta Tirk di wî warî de bi ser keve, Ewropa çavê xwe ji gelek îhlalkirina mafên mirovan re girt.

Niha ev muhlet tije bûye û hikûmeta koalîsyonê ne li hember PKK'ê bi ser ketiye, ne jî di mafên mirovan de tiştê kiriyê.

Niha dewleta Tirk amadekariya hareketa hundirîn dike û bi vê herketê dixwaze zîlm û zordariyê zêde bike.

Lê, Ewropa êdi destek nade Tirkîye wê ew jî desteka xwe jê bikişîne. Ji ber vê yekê Tirkîye nema dikare vê politikaya xwe bimeşîne."

## Şerafettin Elçi şîretan dide dewletê


Rojnameya rojane "Turkish Daily News" ya ku li Tirkîyê bi zîmanê Îngilîzî tê weşandin, bi navê "Kurdên dîtînerm partiya legal diwaxazin" nûçeyekê di rûpelê xwe yê pêş de derxist. Ev nûçeya ku roja 1'ê Kanûna 1992 an de bi xameya Murat Yetkin hate weşandin; bi giştî li ser ramanên Kurdên dîtînerm bi taybetî jî, li ser ên Şerafettin Elçi diskîne.

Ev nivîskarê "Turkish Daily News", li ser PKK'ê, pîrsa Kurdî û partiya Kurdî ya legal dîtînen Şerafettin Elçi jê dipirse. Elçi van dîtînen xwe bi awayê li jêr derpêşe rojnameya "Turkish Daily News"

dike:

"PKK, bi helwesta xwe ya totalîter û otorîter rê li hemû rêxistinên Kurdî digire. Pêkanîna politikayên dewletê yê hişk, gelê Kurd ber bi PKK'ê ve dehî dide. Ji bo pîrsa Kurdî, bi riyên demokratîk çareser bibe, divê Tirkîye bendên li pêşiya damezirandina partiyên legal hilde." Elçi şîretan ku li dewletê dike wiha didomîne: "Helbet mafê her dewletê heye, bi kesên çekdar ên li dijî wê nere, şer bike. Lê dema dewleta Tirk li dijî PKK'ê şer dike, lazim e zîrê nede kesên sîvil û derfeta pêkanîna têkoşîna demokratîk bide gel.

Ger riyên demokratîk vekiribû-



na, piştgirîya gelê Kurd ya ji bo PKK'ê wê pîr hindik bûbûya."

## Kî bêhtir faşîst e?

Navenda Nûçeyan- Li Almanya, êrişên ku Neo-nazî dibin ser biyaniyan, li Tirkîyê dibe sedemê hin bûyerên balkêş, Neo-Nazî û nijadperestiya ku li Almanya berê xwe daye biyaniyan, rewşa Tirkîyê guhertiye. Îro tu kes nemaye ku nebûbe anî-nîjadperest an anî-nazîst. Li hêla Behra Reş (Karadeniz) kesên ku heta doh jî sond dixwarin ku wê Kurdan biqelînin, di merasîma 3 kesên ku li Almanya hatin kuştin de, sloganên anî-faşîst bilind dikin û naletê li nijadperestiya Almanan dibarînin. Ne tenê li hêla Behra Reş, li hemû deverên Tirkîyê rewş wilo ye. Gelê Tirk, bi yek dengê li dijî nijadperestiya Naziyan radibin û naletê lê dikin. Di vê navê de, kuştin, şewitandin û talankirina Kurdan jî, ji bîr nakin. Ji bo wan Kurdên baş, Kurdê mirî ne.

Tirkên ku li Almanya ji alî Naziyan ve têne kuştin, an birayên wan an kur an jî lîzîmên (qeba) wan, li Kurdistanê gel dikujin, malên wan talan dikin û dişewitînin. Li bajar û metropolên Tirkîyê, êrişan bi ser Kurdan ve dibin, lînc dikin, avahiyan wan dişewitînin. Di cenazeyên leşkeran de, sonda tune kirina Kurdan dibe slogana wan û vê sondê, di her fersendî de pêk tînin.

Rêvebirên dewletê û çapemeniya Tirk, di vê kampanya durû ya li hember Naziyan de, serî dikşînin. Naziyan protesto dikin û rexneyan li hikûmeta Alman digirin. Li aliyê din, li Kurdistanê kevir li ser kevir nahêlin, her roj bi dehan kes dikujin, mirovên kuştî li dû tanqan dikişînin û ev hemû kirin di çapemeniya Tirk de, bingehên xwe li ser îdeolojiya Tirkbûnê

bilind dikin û tene parastin.

Bûyerên li Almanya, bi aliyeke xwe ve, rûreşî û durûtiya dewletê û çapemeniya Tirk derxiste holê. Îro li Almanya, Nazi ne xwediyê iqtîdarê ne. Piştî her êrişî an tene girtin an jî, li hember wan protestoyên girseyî çêdibin. Her çiqas ne ji dil bin jî, rêvebirên dewletê jî di van protestoyan de cihê xwe digirin û bi xelkê re, li hember faşîzmê diskînin. Lê li Tirkîyê?

Li Tirkîyê dewlet bi xwe faşîst e û failê cîniyetan e. Parêzgerê wî yê herî mezin jî çapemenî ye. Mixabin bi giştî gelê Tirk jî, bi nezani dibe şîrikê van gunehan. Nijadperestî, îdeolojiya dewleta Tirk e bingehê hebûna wan e. Li vir divê pîrsêk bê kirin. Gelo kî bêhtir faşîst û nijadperest e? Bersiva vê pîrsê, di hemû gotinên rêvebirên dewletê de ye, eşkere ye.



# PÊNÛS



Amed Tigrîs

## Xwendin baş e lê ku ji bo mirov be

**X**wendin baş e. Xwendina bilind baştir e. Îro li her derê dinyayê hewl û armanca her kesî ji bo xwendina bilind e. Her dê û bav dixwazin ku zarokên wan vê prosesê (domanê) bibin serî. Hejmara hemwelatîyên xwenda çiqas zêde bibin, civak jî ewqas ji aliyê kultur, zanîn, teknîk ve bi pêşve diçe. Ji ber vê hindê her dewlet ji destpêkê heta universîteyan dibistanên cur be cur çêkirine û dikin. Ev dibistan dezgeh û sistêmên perwerdeya civakê ne. Her çiqas hejmara û sewiya perwerde û hîndekariya hemwelatîyan zêde û bilind bibe, ewqas ew civak û welat jî, bi pêş dikeve. Lê gelo ev ji bo me Kurdan jî derbas dibe?

Belê ev ji bo me Kurdan jî derbas dibe. Lê bi ferqê. Ev ferq çî ye? Ferq ew e ku mirov ji bo xwe bixwîne. Yanî ji bo gel û welatê xwe. Ne ku bixwîne û xwe înkâr bike. Bixwîne û li dijî têkoşîna gelê xwe derkeve. Bi dijmin re bibe yek.

**Dibistana herî mezin û muhîm mal e. Zarok di malê de mezin dibe û reng û formê xwe digire. Divê bi xwendinê re zarok xwedî zanabûn û hîsên milî bibin. Ziman û kultura xwe bizanibin. Ji xelkê xwe û jiyana xelkê xwe bi dûr nekevin. Ji biçûktiyê formê xwe ya milî bigirin, an jî dema mezin bibin xwe naskirin gelek zor dibe.**

welatê xwe bixwîne. Zanabûn û enerjîya xwe ji bo damezirandin û avakirina welatê xwe bi kar bîne... Hikmet Çetin, Kamuran İnan jî xwendine, lê xwendina wan ji bo kuştina Kurdan û wêrankirina Kurdistanê ye. Lê, pismamên Hikmet Çetin ji ber feqîriyê nikaribûn bixwînin. Lê ew Kurd in. Hikmet qurbana axa binê şekala wan be, herê wele û bile! Ên Kamuran jî wiha ne. Şivan û gavanên Bedîsiyan hezar car ji Kamuran camêrtir in. Welatparêzîr in. Demokratîr û zanatîr in.

Niha li derê welat ew kesên penaber (multecî) ên politîk, zarokên xwe didine xwendinê. Baş e, ji bo wan fersendekê baş e. Lê, xwendineke çawa? Heger zarok bixwînin û bi xwendinê re kultur û zimanê xwe ji bîr neke, xwe di nav civaka Ewropayê de winda neke û xwendina xwe ji bo rojên pêş, ji bo welat û xelkê xwe bi kar bîne gelek baş e. Lê, ku bixwîne ji bo nanê zikê xwe, ji bo malbata xwe û welat û mirovên xwe ji bîr bike, ev xwendin ji çî re dibe? Gelek Kurdên Başûr û Başûrê Rohîlat li welatên sosyalişt xwendin, niha rewşa wan çî ye û çawan e? Herwiha li welat jî, bi hezaran li Iraq, İran, Sûriye û li Tirkîyê kesên Kurd hene ku xwendina bilind temam kirine. Xwediyê kar û meqam in. Lê, firqa wan û Tirkekî jî hev tune ye. Ew Kurdên xwenda yê wiha ji çî re dibin gelo? Ew tune bin baştir e. Heger ew îro nexwendabûna dibê ku li serê çiyê bûna, an jî di nav serhildanan de bûna. Ji bo gelê xwe şer bikirana. Niha hinek ji me bûne heyrana zimanê Îngilîzî, zarokên xwe ji bo Îngilîziyê dişînin Amerîka, Kanada, Îngilîzîtanê... Îngilîzî hînbûn baş e, lê ji bo çî? Heger Îngilîzî hîn bibin û ew wek turfîst nikaribin hefteyekê jî herine Kurdistanê; wê demê ew û Îngilîziya xwe bikevin bin erdê baştir e. Na ku ji bo şexsê xwe hîn bibin, wê demê ma çî ferqa wî/wê û Îngilîzek jî hev heye? Bi hezaran kesên ku bi xwe Îngilîz in, qûnpîne ne dikone, serzilût in. Serxweş in, li kuçan radizên.

Dibistana herî mezin û muhîm mal e. Zarok di malê de mezin dibe û reng û formê xwe digire. Divê bi xwendinê re zarok xwedî zanabûn û hîsên milî bibin. Ziman û kultura xwe bizanibin. Ji xelkê xwe û jiyana xelkê xwe bi dûr nekevin. Ji biçûktiyê formê xwe ya milî bigirin, an jî dema mezin bibin xwe naskirin gelek zor dibe. Li Ewropa an jî li metropolan gelek zor e ku zarok xwe biparêzin û xwe winda nekin. Dibistan bi xwe li gor armanca dewletê hatine program û sistematîkkirin. Li gor armanca dewleta xwe zarokan dixwe û asîmîle dike.

# Mîr Celadet Bedirxan û çîroka berhevkirina alfabeya Kurdî - Latîni

## Konê Reş

(2)  
Tê xuyakirin ku, nemir du tîp ji alfabeya xwe avêtine, ew herdu tîp ev in: H - X in, ji ber ku wî ew herdu deng biyanî dîtine, di babeta wan de wilo dibêje:

"Ji van pê ve du herfên biyanî ko birek ji Kurdan wan dibêjin, lewra ko ew herfên ha di eslên xwe de "4" ne Kurdî ne, me ew nexistîne alfabeya xwe..."

Vêca nemir ev herdu tîpên ha, veqerandine ser tîpên Kurdî, di bin "H-X" de, ji ber ku pirraniya Kurdan van herdu tîpan li şûna (X, Ç) û (H, Ç) dibêjin weke:

Xeyidîn - (X)eyidîn  
Hevt - (H)evt

Hem jî Mîr Celadet serwest bû ku, bêtirî sîh û yek dengî di zimanê Kurdî de peyda dibin weke:

Çem û çiya: *چەم و چیا*  
Kal û K'al: *کال و کال*  
Par û P'ar: *پار و پار*  
Ta û T'a: *تا و تا*

Lê wî didît ku dema şagirt di dibistanan de hîn xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bibin hingê wê karibin van dengan ji hev bidin alî û derxînin û bi serbestî wê tîbigihîjin. Weke Ereben ku rojname, pirtûk û kovarên xwe dixwînin bê "Kesir û Fethe" ji lew re nemir ev danganan dîrî alfabeya xwe kirine, hem jî ku alfabeya wî giran nebe li ser xwendevanan.

Di dema îro de birek ji rewşên birên Kurdan doza wan dengên dîkin, yek ji wan "Ordixanê Celîl" ku ez çav pê ketim û li ser vê yekê me li ber hev da gelekî... Ez bawer im ev doza wan wê boş here û naçe serî tenê wê alfabeya Celadet Bedirxan ji zimanê Kurdî re her bimîne...

Nemir, nişaneke bijart ne weke nişanên xelkê û bilindek nav lê kir "A". Ji ber ku dengê tîpan hem bilind dike û hem jî diguherîne ev bilindek ji nişanên biyaniyan belû ye. Nemir, nemaze zimanê Kurdî di dengê tîpan de dîtîye, ku deng li ser kaxezê bi şiklan tîpên sekinandin û şikil bi tîpan tîpên naskirin û her tîpek bi dengê serbixwe, bê nişankirin duristîr e ji tîpên 20-20 "dudengî." Weke: (sh=s), ji ber ku hînbûna xwendin û nivîsandine bi tîpên serbixwe ji yên 20-20 (cot) hêsantir û zûtir pê tê nivîsîn û xwendin.

Mîr Celadet Bedirxan alfabeya xwe berî, alfabeya Tirkan danî, di 1928 an de. Lê paşî wan belav kir, vêca xwest ku nêzikî alfabeya Tirkan be, ne dîrî wê be, ji bo xatirê Kurdên Tirkîyeyê ew ên ku bi alfabeya Tirkan zanîn û pê dixwînin, ku karibin bê dijwarî hîn alfabeya Kurdî-Latîni bibin. Da ku kovar û rojnameyên Kurdî bi zimanê xwe bixwînin, hem ji ber ku gelê Kurd li Tirkîyê bi tîpên Latîni dixwendin û dinivîsandin hem jî nikaribûn ku pirtûk û rojnameyên Kurdî yê bi tîpên Erebi bixwînin. Ji ber ku Kurd û zimanê Kurdî li Tirkîyê qe-

dexe bû. Têvî vê yekê jî, alfabeya Tirkî û ya Kurdî, gelekî ji hev cihê ne, ya Tirkî ji "bîst û heşt" tîpên bingehîn kom dibe, (Q) û (W) tê de nîn e û tîpa (V) deng dide weke tîpa (W) ya Kurdî (G) weke (ج "cîm") ya Misrî tê lêvkin, geh jî weke (ع "xeyn") ya Erebi deng dide, ji bilî hin tîpên din ku kêm û zêdene ji hev, di nav herdu alfabeyan de.

Belû ye, ku Celadet Bedirxan di gelek zimanan de xebitîye, di pîr asteng û dijwariyan re buhîriye ta ku alfabeya xwe berhev û berdest kiriye. Ku bûye alfabeya Kurdî-Latîni û dema îro kovar, rojname, ferheng û gotar li Kurdistanê Tirkîyê, Rewanê, Sûriyê, Libnan û Ewropa pê tîpên nivîsîn û çapkirin...

Beeçeyekê ji zimanê Kurdî re berhev bikin, ji Kurd û biyaniyan, berî Mîr Celadet û piştî wî, ji wan kesên dostên miletê Kurd, zimanzanê Ermenî "Morogulov" gava rê li ber Kurdên Rewanê hate vekirin, vî camêrî alfabeyê Kurdî-Latîni ji bo zimanê Kurdî berhev kir, alfabeya wî hat çapkirin sala 1931 an û pê hat xwendin û nivîsîn, lê paşî sala (1938) an fermanek hate deranîn ku alfabeya Kurdî bi tîpên (Kirîlî) Rûsî ji Kurdan re bê danîn û ta roja îro rojnameya "Riya Teze" bi alfabeya Kirîlî tê çapkirin û alfabeya "Morogulov" hate ji bîr kirin...

Lê di dema îro de, gelek ji Kurdên Ermenîstanê alfabeya Mîr Celadet Bedirxan ji ya "Morogulov" baştir dibînin, ji ber ku Kurdî hêsantir pê tê nivîsîn, niha Kurdên Rewanê bi alfabeya C.B. dinivîsîn û pirtûkên xwe pê çap dikin.

Ji bilî Morogulov mamoste "Tewfîq Wehbî" jî paşî belavbûna alfabeya Celadet, wî di sala 1933 an de pirtûkên bi navê "Xwindewarê Baw" belav kir, hem jî sala 1966 an bi Mîrza "C.J. Edmonds" ferhengeke Kurdî-Îngilîzî berhev kirin.

Di herduyan de, her "bîst û şeş" tîpên Îngilîzî kirine bingeh, di "Xwindewarê Baw" de, Tewfîq Wehbî pênc tîpên zo-zo "cot-cot" weke -gh, sh, rh, lh, ch- bi ser her bîst û şeş tîpên Îngilîzî de ber dane. Lê di ferhengê de, ji bilî van her pênc tîpên cote-cot, wan şeş tîpên din bi ser wan sîh û yek tîpên bûrî de ber dane. Wiha ferhenga wan bi sîh û heft tîpan pêk hatiye. Li

"London" çapkirine.

Lê ne pirtûka wî û ne jî ferhenga wan cih di nav Kurdan de girtine.

Ji bilî Wehbî, Mamoste "Cemal Nebez" jî, pirtûkek daniye, çend guhertin di alfabeya Zendî Celadet Bedirxan de kirine. Vê dawiyê nemirê bi nav, û deng "Kîyo Mokiryanî" di sala 1972 an de, pirtûkek ji alfabeyê bi tîpên Latîni berhev kir. Lê ya wî jî weke ya Mamoste Nebez kesî guh lê nekir û di ser guhan re hate avêtin.

Tenê alfabeya Celadet Bedirxan berdest, berdeyam bi nav û deng di nav Kurdan de dom û dirêj kir, ta roja îro. Divê çav neyên girtin ji xebat û karên hin kesên din ku, di vî warî de kêmayî nekirine, weke Mamoste Musa Anter, Osman Sebrî, Cegerxwîn û Qenatê Kurdo...

Hêja ye ku gelê Kurd, navê lehengê pêşîn lê bikine, ji ber ku wî zimanê Kurdî yê ku gelê Kurd di pişt guhên xwe re avêtibûn, ji windabûnê da hev û belav kir. Di nav gelê Kurd de, bi riya kovarên xwe "Hawar û Ronahî" da ku hînbûn û zanîn bê belavkirin. Jixwe xuya ye ku zanîn, nasîne dide û nasîna rîya felat û xweşiyê vedike.

Û hêja ye ku gelê Kurd, xwe paye bike bi vî lehengê bi nav û nişan weke miletên ku xwe paye dikin bi lehengên xwe. Bê guman e Celadet Bedirxan, lehengê ziman, rojname û çanda Kurdî giştî bû.

1. Celadet Bedirxan; nameyek ji Mustafa Kemal Paşa re wergerandina Rewşen Bedirxan. Beyrût 1990 r.34 bi Erebi.

2. Celadet Bedirxan, nameyek ji Mustafa Kemal Paşa re wergerandina Rewşen Bedirxan, Beyrût 1990, r.36

3. Celadet Bedirxan, Hawar, j.1, r.3, Şam 1932

4. Celadet Bedirxan, Hawar, j.2, r.3, Şam 1932



Celadet Bedirxan



# Koma Berxwedan Stranên gelêrî

Beşa muzîkê ya Navenda Çanda Mezopotamya qaseta xwe ya sêyemîn bi navê "Helbestên Bijartî yên Koma Berxwedan" derxist. Ev cara yekemîn e ku klam û stranên Koma Berxwedan bi destûra Wezareta Çandê dertê.

Qaset ji 13 klam û stranên kevn ên Koma Berxwedan hatiye dagirtin. Bi taybetî jî, ji stranên govend û dilanê. Ji van stranên yek jê bi tenê ji zaravayê Dimilî (Zazakî) ye.

Qaset ji alî teknîka dagirtinê ve hinekî qels maye. Stranên ku di qasetê de, bi pirranî otantik û gelêrî ne. Lê Koma Berxwedan demeke dirêj klam û stranên gelêrî bi kar anî û naveroka wan a kevn diguhert û di şûna wan de gotinên şoreşgerî datanî. Ev yek bi ya me tehrîbat e. Divê mirov dest nede van nixên neteweyî. Lewre ev hêjahî, aliyekî civaka me dide ronahîkirin. Klam û stranên gelêrî, neynika demek ji demê civakî ne. Tuncbûna toreya (edetê) nivîsîna di civaka me de vê yekê baş dide xuyan. Lewma divê ev nixên me, bê destlêdan bêne gotin, nivîsîn, qeyd û arşivkirin.

Bergê (qapaxa) qasetê bi wêneyeke wênesaz Fevzi Bilge hatiye



**Berga (qapaxa) Koma Berxwedan** xemilandin û arastin. Bi rastî bergê qasetê û naveroka qasetê li hev in.

Di qasetê de ev stran û klam hene.

## Beşa A

1. Baran Barî: X. Xemgîn û Zozan
2. Hûr Hûr Lêxin: Çiya
3. Gulê Cihanê: Dîlar
4. Wî Dayê (Dimilî): Sefqan
5. Gulê Çiya Bilind in: X.Xemgîn
6. Bihar xweş e: X.Xemgîn

## Beşa B

1. Gundîno Hewar: Mizgîn
2. De Bimeş Bimeş: Zinar
3. Koçerê: Sefqan
4. Kaniya welat: Çiya
5. Di Tarîka Şeva Hicran: X.Xemgîn
6. Mendo: Zinar
7. Biskên Te Zirav in: Sefqan

## Yekîtiya Xwendevanên Kurdistanê- YXK

Gelî dost û hevalên hêja,

Em bi vê nameyê we vexwendî Kongreya Yekîtiya Xwendevanên Kurdistanê (YXK) a yekemîn dikin. Herwiha di wê komcivînê de du xwendevanên Diyarbekir/ Amedê beşdar bibin, da ku peymana hevalbendiya zanîngeha Amedê bi du zanîngehên Almanya re bi fermî were pejirandin.

Pêşniyar ji bo bernameya komcivînê ev in:

Rojev

Roja yekemîn

1. Vekirin

2. Hejmartina berpirsiyarên civînê

3. Hejmartina mirovekî ji bo nivîsandina protokolê

4. Rapora Berpirsiyarên YXK'ê

a) Axaftin li ser rewşa rojane (roman)

b) Rapor li ser karê derbasbûyî

5. Çêkirina komikan li ser:

a) Pirsên jinana

b) Kovar

c) Ragihandin (karê derveyî)

Roja duyemîn

6. Axaftin li ser kar û encamên komikan.

Çêkirina planekî ji bo pêşerojê.

7. Hejmartina berpirsiyariyê

8. Hejmartina koma kontrolkirinê

9. Û hin tiştên din

Kongreya YXK'ê wê du rojan bidome

Dem: 12-13.12.1992

Cih: Jugend Gästehaus, Köln-Riehl, An der Schanz 14, 5000 Köln 60

Katjimêr: 9.00

Ji bo ku em bizanibin çend kes beşdarî komcivînê bibin, em hêvîdarên ku hûn heta 20'ê Mijdarê 1992 an agahiyekê li ser beşdarbûna xwe ji me re bi rê bikin.

Her mirovê ku beşdarî Kongrê bibe divê 50 DM ji bo raketin û xwarinê bide.

Bi silavên hevaltî

**Komîta Kargêr YXK**

# Mestek... Ji Şîna Bêcir

## Salar Amedî


Ev pirtûk ji aliyê "Weşanên Komeleya Jinên Kurdistanê li Swêdê" di sala 1990 an de hatiye weşandin.

Di pirtûkê de helbestên du helbestvanan hene. Yek jê Ahmet Huseynî, yê din jî Mihemed Efiş Huseynî ye. Mihemed Efiş Huseynî helbestên xwe bi Erebi nivîsiye. Ji ber ku me jî bi Erebi nizanibû û me nikaribû em bixwînin, raman û şîroveya xwe jî me nikaribû binivîsandin.

Ehmet Huseynî bi Kurdî û tîpên Latîni helbestên xwe nivîsîne. Navê pirtûka wî "Mestek... Ji Şîna Bêcir" jî bo helbestên her du helbestvanan jî Novîn Harsan pêşgotinek nivîsiye. Di nivîsa xwe de wiha dibêje: "Ji ber ku her du jî piştgiyê helbesta nûjen in û bi gotinên sivik dikarin şênê binivîsin, bi zimanên cuda dixwazin bibêjin." Helbestên vê pirtûkê bi taybetî li ser Helepçe hatine nivîsandin. Helbestek gelek delal jî, li ser hozan û hunermendê nemir, bavê felek Mihemed Şêxo hatiye nivîsandin.

Di van helbestan de kafiye û arûz tune. Her wekî Novîn Harsan jî dibêje, helbestên nûjen in. Naveroka helbestan gelek delal e. Lê li gor zimanê gelêrî zimanê wî hinek giran e û di hin cihan de zimanê herêmi hatiye bikaranîn. Hin cihan jî, ji bo mirov karibe fêhm bike divê mirov çend cara li ser hev û din bixwîne.

Hem ji ber ku gelê me hê hînê hel-



bestên nûjen nebûye û zimanê nivîsê jî, hê baş nehatiye hînbûn, helbestên bi vî rengî wê kêr mirov jê fêhm bikin. Hinekî din jî bi zimanê gelêrî hatibûya nivîsandin wê êdî çêtir bûya. Li gor baweriya me, her huner divê ji bo gel bê çêkirin. Bi taybetî jî, ku mirov endamê gelekî bîndest be divê mirov hunera xwe bike. Ev awa bi taybetî jî bo gelê Kurd gelekî girîng e.

Tevî her tiştî jî, weşanên wiha gelek hêja ne û ji bo edebiyata Kurdî, serkeftin û pêşketina her ozan, hunermend, nivîskar û hwd. jî daxwaza me ye.

## Rewşen û naveroka wê

Hejmara heftemîn ya Kovara Rewşen'ê kovara çandî, hunerî, wêjeyî û zanyarî ya Navenda Çanda Mezopotamya, derket.

Rewşen dişa mina hejmarên xwe yê pêşî cih daye nivîsên li ser dîrok, helbest, wêjê, huner, ziman û hwd. Di vê hejmarê de çend gotarên qenc der barê ziman, zaravayê Kurmancî û Dimilî de, li ser romana Kurdî li ser dîrok û wêjeya Kurdî hene. Navê çend gotar û nivîskarên wan ev in: Romana Kurdî: Amed, Ziman û Rastnivîs Feqê Huseyin Sağnıç, Wêjeyên Iranî yê Kevn: Pierre LECOQ, Felsefê û ziman: Şemsetin Ronahî, Di Kurdî de Eyleta Bêje, Biwêj û Organên Mirov. Amed Tigrîs, Zaravê Dimilî de Name: L.Jandil, Şêx Seîd, Abdurrahman Durre...û çend gotar jî bi Tirkî tê de hene.

Rewşen her diçe, ji her alî ve, ber bi pakbûnê ve diçe, lê belê bi ya me tê de cihgirtina nivîsarên bi Tirkî kêmasiyeke e. Lewre hemû rojname, kovar û weşanxaneyên me li ser tiştên herî politîk bi Tirkî weşanê dikin. Divê Rewşen vê yekê bide ber çavên xwe. Em nabêjin bila



behsa tiştên politîk neyên kirin, jixwe her xebat û kirinên me ji siyasetê cihê nîn e.

Lê ku Rewşen kovareke bi Kurdî be divê bi zaravayên Kurdî tiştina binivîse.

Dişa jî kovarek ku li gel hemû asengiyên bi vî rengî dertê, ji alî çanda Kurdî ve dewlemendiyek e û divê bê xwendin û parastin.



Di bîranînên Çağlayangil de  
îdama Seyîd Riza - 2

# Mirovê kal meşiya Celad daf da Kindîr xiste stûyê xwe Bi piyên xwe li kursî xist Û bixwe xwe îdam kir

Çûm cem Midûrê Emniyetê İbrahim Beg. Ji min re ji bo dozger (sawcî) wiha got: "Ew li dijî qaîdan tu tişt nake."

Ez ji wir, çûm cem dozger. Min rewşê jê re got. Wî jî gote min ku di vê mijdarê de Wezaretê Edaletê şifreyek girtiye, lê mehkeme rojên şemiyên di tatîlê de ne û di tatîlê de jî, ne mimkun e ku encam bê girtin. Dû re wiha got:

"Ez nikarim li mehkemyan tesîrê bikim."

Lê me dixwest ku mehkeme, bila biryara xwe beriya hatina Atatürk bide û dema Atatürk hate jî, mesala Seyîd Riza bila hatibe girtin. Ez ji bo helkirina vê, ji alî hikûmetê ve hatibûm şandin.

## MAFÊ TEMYÎZÊ TUNEBÛ

Alîkarê dozger, ji dibistana hiqûqê hevalê min e. Ji min re got: "Ji walî re bêje, bila rapor bide vî dozgerî. Ezê daxwazên te bînim cih."

Me daxwaza, di tatîlê de karkirina mehkemê û çî encam bê girtin înfaza wê dikir.

Dozger rapor stand, hevalê min jî, bi wekilî li cihê dozger rûnişt.

Min dadgerê (hakimê) mehkemê li mala wî dît. Biryara mehkemê dida nivîsandin. Ez bi dadger re axivim.

Dem dema CHP'ê ye. Herkes ditirse.

Dadger ji min re wiha got: "Mehkeme roja şemiyê naceve, lê emê roja duşemê mehkemeyê bicivînin û biryara îdamê bidin, roja

sêşemê jî, wan îdam bikin."

Di wê demê de, li herêma çaran, mafê temyîzê tune ye.

Dê Abdullah Paşa wek Serokê Rêveberiya Taybetî, biryarê tesdîq bike. Wî jî, li kaxezeke vala nivîsiye "Biryara li jorin hatiye tesdîqkirin" û îmze avêtiye wî kaxezê vala. Li jora kaxezê bê nivîsandin "îdama Abdullah Paşa", wê ew bi xwe bê dardekin.

Me ji dadger re got:

"Roja ku hûn dibêjin Atatürk tê, bi vî awayî jî, armanca me nayê cih."

Dadger: "Wekî din nabe." Min jê pirsî:

"Hûn tu car, piştî saet 17.00 an mehkemeyê didomînin?"

Ooo, gelek caran. Roj dibe, heta saet nehan dixebitin.

- Hûn dikarin 5 saetê zêde bixebitin, gelo çima vê 5 saetê nikarin bidin pêş û 5 saet zû dest pê bikin. Yanî bila roja yekşemê, piştî paşivan, mehkeme vebibe. Lewre roja duşemê saet ji 00.24 an ve dest pê dike."

Dadger: "Cereyan tene birîn."

Me ji wî re jî çare dît. Me got: "Em dê bi farên otomobilan girtîgehê rohnî bikin û luksan binin "Halkevi".


## DOZGER ÎDAMA 27 KESAN XWEST

Dadger vê carê wiha got: "Kindîr tune ye."

Me ew jî çareser kir. Me got: "Emê kindîr jî binin."

Dê çend kes bîn îdamkirin?

- Ez nikarim beriya biyargirtinê bêjim." Lê, dozger



Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Riza

Wêne: Xelîl Ziravav

îdama 27 kesan xwest.

- Em amadekariyên xwe, li gor 27 kesan bikin?

- Ez nizanîm.

## HÛN JI BO DARDEKIRINA MIN HATIN?

Qanûnê cezayî yê înfazê, ji bo yên tên îdamkirin, hevûdu nebînin, emir dikir ku cihê sêpiyan jî hev cuda bin. Me vî şertî jî bi cih anî; li her meydana sêpiyek danî. Walî jî mirtibekî celad anî. Saet li 12.00 an em çûn girtîgehê. Me bi faran ronahî da der û dor. 72 girtiyên mehkemê hene.

Mehkûm hilanîn û birin mehkemeyê. Celad jî hat. Ji bo her mirovî 10 wereqê xwest. Me jî qebûl kir.

Mehkûm bi Tirkî nizanin. Mehkeme biryara xwe beyan kir. Ji bo 7 kesan biryara îdamê hatiye dayîn, hinek jî mehkûman jî berat bûne, çend kes jî, bi awayên cure cure hatine cezakirin.

Dema biryar hate xwendin, ji ber ku di beyanê de gotina îdamê derbas nebû û di şûna wê de, peyva "ceza-yê mirinê" hate bikaranîn, hinek jî mehkûman baş fêm nekirin û welweleyeke wek "îdam tune" bilind bû.

Me Seyîd Riza bir. Di otomobilê de, di navbera min û Midûrê Polisan İbrahim de rûnişt. Jeep, li meydana kêleka qereqolê sekinî.

Dema Seyîd Riza sêpiyan dît, rewşê fêm kir.

- Hûnê min daleqînî?

Li me vegeriya û wiha got.

- Tu ji bo îdamkirina min, ji Enqerê hatî?

Me li hev nihêrî. Ev cara yekemîn e ku ez, bi yekî ku dê bê îdamkirin re rû bi rû dibim. Keniya. Dozger jê pirsî: "Tuyê limêj bikî?" Nexwest. Me gotina wî ya dawî jê pirs kir.

- 40 wereqeyê min û saetke min heye. Bidin kurê min.

Di vê navê de, Hafiz dihat îdamkirin. Di dema daleqartdîne de, du car kindîr qetiya. Min ji bo Seyîd Riza nebîne xwe da ber pacê.

Îdama Hafiz xelas bû. Me Seyîd Riza derxist meydana. Hewa sar bû û li der û dor tu kes tune bû. Lê Seyîd Riza, weke ku der û dor da-girtî bin, ji bédengî û valahiyê re axivî.

-Ev zilm e, cîneyet e, xeta ye.

Ez di cihê xwe de sar bûm. Ev mirovê kal, bi repep meşiya. Wî celad daf da. Kindîr xiste stûyê xwe. Bi piyên xwe li kursî xist û wî bixwe xwe îdam kir.

Mirov nikare ber bi mirovekî wiha ku serbazên di temêne kurê xwe de bûn dikuşt, bikeve. Lê min nikaribû cesareta vî kalî teqdîr nekim.

Esabê min, gelek xerabû. Min ji Midûrê Emniyetê re got "Li min sar e. Ez dê biçim otelê." û çûm.



# Çîrokbêjê Don'ê ŞOLOHOV

Murat Ergin

Mihail Aleksandroviç Şolohov, di sala 1905 an de li Rusyayê li Kazakistanê li ber çemê Don'ê li gundê Veşenskaya hatiye dinê. Şolohov kurê malbateke cotkar bû. Hê biçûk bû bavê wî mir. Diya wî, jinekê gundî ya cahil bûye.

Şolohov gava di sala 1918 an de dev ji xwendina lîseyê berda û li dijî Rûsên Spî (Kontrayên Sovyetê yên wê demê) şer dikir, hê 14 salî bû. Eynî di vê salê de ji ket nav Partiya Bolşevîkan. Di sala 1920 an de vegeyriya gundê xwe yê li ber çemê Don'ê, bi şûn de du sal li Moskovê ma û di dawiyê de di hate gundê xwe û heta mirina xwe li wir ma.

Şolohov di 18 saliya xwe de dest bi nivîskariyê kir. Di sala 1923 yan de pirtûka xwe ya yekemîn ya bi navê "Tecrûbe" nivîsî. Di sala 1924 an de ji pirtûka wî "Zikreşî" derket. Lê ev herdu pirtûk ji pîr eleqe neditin.

Di van herdu hikayeyan de jî, behsa deverên derdora çemê Don'ê dihate kirin. Ji zaravayê wê herêmê (deverên dora çemê Don) bigirin ta şertên tebieta wirê û jiyana mirovên wirê di van çirokan de dihate zimên.


"Ji bo mirov karibe kêçekê bigire lezgîniyê divê, lê ne ji bo nivîskariyê."

Ev hevoka li jorê, bersiva Şolohov a ji bo kesên wî bi hêdî nivîsandinê rexne dikin e.

Bi rastî jî Şolohov herdu pirtûkên xwe yên bi navê "Û Bi Bêdengî Dihirikî Don" di 12 salan de (1928-1940) "Erdê Şiyarkirî" jî di 28 salan de (1932-1960) qedandibû. Pirtûkên xwe yên bi navê "Ji Bo Welat Şerkirin" û "Qedera Mirovahiyê" jî di nav van deman de nivîsiye. Lê ev herdu pirtûk jî di bin siya Don'a Bêdeng' de man. Ji ber vê yekê zêde eleqe neditin. Balzac'ê Rûsan Şolohov, tevî pirtûka xwe ya "Bêdêrhildan li Qerexê Don'ê" ve her sê pirtûkên xwe yên bi navê "Û deng di 31 salî de qedandiyê. Kes nîzane di vê 31 salê de Don'a Bêdeng çend caran guheriyê. Ma tenê çemê Don? Dinya jî guheriyê. Û ev guherîn tev xwe di berhemên wî de nîşan dane.

## Û BI BÊDENGÎ DÊHERIKÎ DON

Romana Don'a Bêdeng, bi nivîskarekê xwe Şolohov bûye yek. Şolohov di vê romanê de qala pêvajoya beriya şoreşê, dema şoreşê û piştî şoreşê dike. Bi taybetî jî li ser şerê hundirîn ê piştî şoreşê disekine. Şolohov rewşa Rusyaya 1907-1922 an, di şexsê malbateke Kazak a Melekov de bi dîtinêke realîzma civakî û bi şiklêkî lirîk tîne zimên. Don'a Bêdeng destaneke



Mihail Aleksandroviç Şolohov

herî mezin e ku jî jiyana Kazakan çêbûye. Şolohov jî aliyekî ve behsa têkoşina Kazakan a dijwar a neyartî ku li hember şoreşa Oktoberê dikirin dike, ji aliyê din ve jî weke Tolstoy ew jî der heqê Rusyayê de tiştên ku Rûs jî nîzandin tîne zimên. "Na..!" Dibe jî Şolohov. "Kazak jî di tiştên wek hez kirin, şefqet, evîna welêt de xwedî par in."

Erê di şexsê Gregor Melekov de, şoreş û şerê hundirîn tîne zimên. Lê bi vê re serpêhatiya Kazakên Don'ê jî tê derpêş kirin. Û di nav Kazakan de ne tenê Spî (kesên li dijî şoreşê) hene. Weke ku di cilda romanê ya duyemîn de jî nivîsiye, di nav Kazakan de kesên şoreşger ên Bolşevîk jî derdikevin. Li aliyê din ev roman, belkî jî destana evîneke mezin e. Lê ev evîna ne weke çemê Don Bêdeng e. Evîna Gregor û Aksinya evîneke dijwar, lezgîn û bi şewat e. Û nivîskarekê vî evîna bi şiroveyeke insaniyê û bi şiklêkî lirîk diherikîne. Û ev evîna di rûpelên ku tê de şer, mirin, kuştin, nexweşîn, cudabuyîn serûbin-buyîn hene de weke senfoniyekê bi xerîngin dimeşe.

Şolohov bi romana xwe bûye xelekek ji zîncira realîzma Rûsan ku jî Puşkin û Tolstoy dest pê kirin

û heta hatiye realîzma civakî ya Gorkî.


Şolohov bi vê berhema xwe di sala 1941 an de xelata Stalin kar kir. Di sala 1965 an de jî, xelata Nobelê ya Edebiyatê stand. Piştî ku Şolohov xelata Nobelê stand nivîskarekê Fransî Henri Troyat jî bo wî wiha digot: "Wî uslûba xwe ya efsanewî û hezkirina tebiatê di kesayetiya xwe de berhev kiribû. Di pirtûkên wî de tund (şiddet) û helbest bi şiklêkî bêhempa bi hev re dimeşin." Nivîskar di sala bi pirtûka xwe ya Bêdêrhildan li Qerexa Don'ê, di 1960 an de xelata Lenin stand.

Şolohov jî bo xelata Nobelê bistîne bi tevî jin û zarokên xwe ve çû Swêdê. Jixwê Şolohov di pêvajoya jiyana xwe de tenê di sala 1935, 1957 û 1960 an de çûbû welatên Îskandinavya û di 1962 an de jî li hinek welatên Ewropa geriyabû. Lê piştî ku di sala 1965 an de jî bo xelata Nobelê bistîne çû Swêdê û hat, vegeyriya gundê xwe û heya mir jî li wir ma. Ew, herdem di nav Kazakan de jiya. Wî jî gundekî biçûk jiyana Kazakan a tevlihev bi romanên xwe wek şaxên çemê Don'ê belav kiribû.

Çavkanî: Ana Britannica

## AZADÎ

Abdurrahman Durre



### Şêr û rûvî

Şêr û rûvî dibin destbirayê hev û din û bi hev re digerin. Rûvî dixwaze ku tiştêk bî-ne serê şêr û goştê wî bixwe. Tê ber zerîbeke (uçurum) mezin, dibe waqe waqa wî, fîxan û fîzar dike, hêsir ji çavên wî dikişin. Şêr dibêje: "Birayê rûvî! Li te xêr e? Tu çima digrî?" Rûvî jî kezeba xwe dinale û dibêje: "Birayê şêr; ez bi bavê te yê rehmetî re hatibûm ber vê zerîbê. Rehmetî, xwe ji vî aliyê zerîbê avête wî alî, weke teyrê bazî firqas kir û çû. Şêr jî wî re tê gotin. Qey tu jî şêr î? Sed heyf ku tu lawê wî yî". Ku rûvî wilo dibêje, hêrsa şêr tê û xwe ji vî aliyê zerîbê davêje wî alî, zerîb xelas nake, singê wî li zerîb dikeve û dişkê. Dibe nirîna şêrê birîndar û bi ser lep dikeve. Rûvî jî pa re bi dizî tê, dev dixê hêta şêr û dixwe. Şêr nikare xwe tev

de. Dibêje: **Bi rastî jî heta îro taktîka wan eynî taktîk bûye; îmha, qetlîam û jenosîd. Îro jî wê taktîka xwe ya hov û qirêj didomînin. Belê gelê Kurd (çêlên şêran) bi wan taktîk û fendên wan ên rûvî hesiyane.**

Rûvî dibêje: "Birayê şêr! Ezê ji pa re bixwim heta di singê te re dertêm. Min bavê te yê rehmetî jî, li vê derê wilo ji pa re xwar heta di singê wî re derketim, tu dixwazî ku ez werim pêşberê te, tu bi min bigirî û min parçe bikî. Ez rûvî me nayem xapandin". Ku rûvî wilo dibêje, nirîn ji şêr tê û diqire, dengê wî diçe kudukên (çêjikên) wî, ji nav dehlê (daristanê) dibezin tên hewara şêr, dor li rûvî digirin. Dibe waqe waqa rûvî, vîjik ber dide. Kudukên şêr, dor li rûvî digirin, dibêjin: "Rûviyê qeşmer, rast e, te bav û kalê me bi fend û fundan xwarin. Lê, êdî dawî li qelaşî û virrên te hatin. Emê heyfa bav û kalên xwe ji te hildin".

Serokwezîr Süleyman Demirel jî, ji nûner (mebûs)ên HEP'ê re gotiye ku "Me heta îro 28 serhildanên Kurd, wiha perçiqandine. Emê vê serhildanê jî, bi eynî taktîk û metodan biparçiqandin û îmha bikin".

Bi rastî jî heta îro taktîka wan eynî taktîk bûye; îmha, qetlîam û jenosîd. Îro jî wê taktîka xwe ya hov û qirêj didomînin. Belê gelê Kurd (çêlên şêran) bi wan taktîk û fendên wan ên rûvî hesiyane û...

Gotineke pêşyan heye, dibêjin: "Rûviyê zexel, bi herdu lîngan dikeve dafikê".

Îro êdî dewra rûvî û durûtiyê çûye. Dewra demokrasî, heqnasî û însanîtiyê hatiye. Bi rûvîti, kûvîti û hovîtiyê tu tişt hel nabe. Gerçî xalê Silo rûviyê pîr e, pîr fend û fundên wî hene, lê çêjikên şêran, êdî wê fersendê nadinê. Em dema ku zarok bûn, me klama mamê rûvî wiha digot:

Rûvî rûvî bi çindik, dêla rûvî bi pindik  
Rûvî kete nav mala, berdan rûvî ket çala  
Bû çewke çewka rûvî, me girt ew wehşê kûvî  
Bendek avêt dêla wî, bir nav konê êla wî  
Dêla rûvî qurîfî, ew ma bi wî dirûfî.



# Heke ev têkoşîn têk biçe...

## Cumalî Cotkar

Ew deli sal in li welatê me şereki germ dom dîke. Neteweya Kurd, bi gavên girs mezin ber bi yekîtiyê ve diçe, dezgeh û saziyên ku ji bo xelasbûn, azadî, demokrasi û serxwebûnê pêwîst in, roj bi roj ava dibin. Gelê Kurd îro gihîştîye hêviyêke bi bingeh. Pêşeroj ronî ye û hêvî ji pêşeroj e. Heke ev qonax bikaribe xwe bidomîne, dê mecala vî şer û têkoşînê, azadî û serxwebûnê be. Lê heke ev têkoşîn têk biçe, dê dîsa hal û rewşa gelê me mirin, qirkirin, penaberî, sirgûn, belavbûn û asimilasyon be.

Ji bo ku gelê Kurd bikaribe ve prosesa (domana) pêşveçûyîna hin ji ber bi pêş ve bibe û armanca jiyaneke azad nêzikî realîte bike û armanca bi realîte be, divê em hemû Kurd bi hemû hêz û qeweta xwe ji bo domandina ve têkoşînê xwe seferber bikin û ji bo xurtkirina tevgerê barê giring hilgirin ser milên xwe. Heke

em ve nekin, pêşeroja gelê me li Asya Navîn asimilasyon e. Welatê me jî, dê ji bo gelên Tirkî yên Asya Navîn bibe Amerîka biçûk. Mirov dikare bi çend gotinên Sovyeta kevn (Turkmenistan, Kazakistan, Ozbekistan, Tacikistan û Kirgizistan) wek tê zanîn dê ber bi başiyê ve biçe. Mumkun e ku "Tirkiya Mezin" bi awayekî di pêşerojê de pêk bê. Ew dewletên Tirkî bi çavêki giring li Tirkîyê dinêrin. Li gor van li Tirkîyê her tişt heye. Ferq di navbera Amerîka û Tirkîyê de tune ye. Rast e, ji aliyê mêtîngehî û nijadperestî ve ev herdu dewlet gelek dişibin hev. Lê mirovên dewletên Tirkî ve yekê nabin. Ê ku wê dibînin û dixwazin bibînin bazara serbest e. Li gor wan ewê bikaribin di aboriyêke wiha de jiyaneke serbest û dewlemend biafirînin. Ji ber van û gelek sedemên din Tirkîyê ji bo wan çihêki balkêş û xweş e. Yanê heke sinor tunebin, ewê hemû werin Tirkîyê û di rojê de bibin kapitalist. Lê em dizanin ku

her mirîşk di xewa xwe de erasê dibîne. Lê dîsa jî mumkun e ku dewleta Tirkî, di pêşerojê de sinorê xwe ji bo wan veke û wan ji bike bela serê me. Îro ve yekê dewlet bixwaze ji nikare bine cih. Ji ber ku şereki neteweyî li welatê me heye û roj bi roj, ev şer mewziyên nû bi dest xwe dixê. Îro ne gelê Kurd ji wan re dibêje "Hûn ser sera hatin" û ne ji ew tî û jiyana xwe dixin talûkê. Lê heke em bi ser nekevin; heke têkoşîna gelê Kurd bi listikên dewletê û hevalbendê wî têk biçe; em hemû divê bizanibin ku pêşeroja me li Asya Navîn di zeviyan pembû dewletên ên Tirkî de rêneberî û koletî ye. Welatê me jî, dê ji bo wan bibe Amerîka.

Bi gotineke din, dewleta Tirkî de neteweya me di navbera wan dewletên Tirkî de par û belav dîke. Em dê sirgûnê Asya Navîn, heta Saraybosna û Romanya bibin. Heke ev têkoşîn têk biçe, kesekî ji endamê civaka me ya Kurd dê nikaribe hebûna xwe, nasnameya xwe biparêze. Em

dê nikaribin ew heqên ku di van salên dawî de bi darê zorê hatine girtin, di xewnên xwe de ji bibînin. Hemû nirxên me yên neteweyî ku bi axa welatê me ve girêdayî ne, dê di bin ling û potinên Tirkîyê Sovyeta kevn de tar û mar bibin. Em dê nikaribin li zimanê xwe, diroka xwe, çand û edebiyat, folklor û muzîka xwe, xwedî derkevin. Mumkun e ku me wek netewe ji holê rakin.

Helbet ev senaryoyek e. Ji bo ku ev senaryo di pêşeroja jiyana gelê me de nebe realîte (rastî), divê gelê Kurd bi ser keve. Gelê Kurd ku heta îro di vî şerî de beşdar bûye û wê dimeşîne divê qet îmkân û mecal ne de ku ev têkoşîn raweste. Divê gelê Kurd bikaribe bi hemû îmkânên xwe domkirina ve têkoşînê bi garanti bike. Ew jî berê hemû tiştê biparastina şerê çekdarî mumkun e. Ev şertê welatparêzî yê yekemîn e. Pişt re divê gelê me ji bo ku plan û senaryoyên dewletê bê encam bihêle, ji bo welatê xwe, ji bo azadkirina axa xwe bi-

be nav û av, çek û bêhn, navgîn û hêvî. Bê van, pîrsa gelê me çareser nabe. Bê van jî çareyên din ji tune ne.

Li aliyê din hin ji hinek hêzên biçûk, malbat, eşîr û ronakbîr û kesên teng hene ku yan li dijî ve têkoşînê radiwestin an jî, ji ve rewşa kritik re dibin temaşekar. Ew xwe li dijî zilm û zordariya dewletê zêde nalivînin. Ew, ji bo ku ne di nav şer de ne, ta de û lêdanê nabin, di jiyana xwe ya "normal" de dijîn. Li gor wan, marê ku bi wan venede, bila hezâr salî bijî. Hinek ji wan li gor xwe bi xeberê "welatparêzî" ve mijûl dibin. Lê divê were gotin ku heke ew têkoşîn têk biçe, ne yên ku jiyana xwe ya normal didomînin û ne ji yên ku bi kêfa xwe xebata "welatparêzî" dikin, dikarin xwe ji mar bifilitînin. Ew jî dê piştî çend salan werin cem me û li kêleka me li Kirgizistanê pembû ber hev kin.

Divê em ve têkoşînê bikaribin bidomînin!

# "Bijî Encûmenî Nîştîmanî Kurdistan"

## Mehabad Kurdî

Helbijardin le mijûyê xebatî rizgarîxwazî gelê Kurdistan da diyardeyekî niwêye. Milletî Kurd ewendey aşnayî derbarey em zarawey niye. Be kurtî pirosey helbijardin bo Kurd şitêki taze ye.

Le Kurdîstanî Başûr helbijardinê le bin balî Hêze hawpeymanekan berpa kira. Rast e gel dengî xoy da, belam eger gel hestî bewe bikirdaye keykem biryarî perleman şerî lenawbirdinî tîkoşeran û azadîxwazan bê, birwa nakem qet dengî xoy bidaye!

Em helbijardine giştî û seranseriyey ke, lejêr alay ERNK "Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan" lem diwayeda çêbecê kira,

helbijardinêke gelê ciyawazî heye legel ewey ke le Başûr pêy rabûn. Kurde warkanî Ewrûpaş beşdarbûn le katî dengdana. Le nêw listey palêwrawan nîştîmanperweranî hemû parçekanî Kurdistan bedî dekirin. Emeş xoy le xoyda cêgey şanazî û serbilindiye bo hemû gelî çewsawey Kurdistan. Em kemeteweweny ke le Kurdisatana nişteçên, ewaniş mafî helbijardinyan hebû. Herweha palêwrawanî beregez xeyre Kurdîş berçaw dekwetîn.

Şitêki aşkiray e barudoxî naskî emroy Kurdistan karigerî xoy her debêt leser rewî em helbijardine da. Mirov herwa be asanî boy nalwêt faktore nawxoyî û derekiyekan lebir bikat û piştigwêyan bi-

xat. Reçaw kirdinî emane girngiyekî taybetî debêt le katî raperandîni karbarekana.

Partî Kirêkaranî Kurdistan PKK, her le mêjûy dirustbûniya hetaku emro çndan hegawî dewlemend û benirxi hawîştîwe, bê guman meseley helbijardin be yekê le hengawe here pêşketwî û giringekani PKK dejmêrdîrê. Nabê eweşman lebir biçêt PKK xawen hêzî lebin nehatûy gelî sistemîdey Kurdisatane!

Le Kurdîstanî emroda ew hêz û rêkxirawane serkewtîn wedî dênin ke girêdiraw bin bo gel û doze rewakey wate azadî Kurd û Kurdistan sersorî û şermezariş bo ewane debêt ke debne kewasûrî ber leşkirî Turke dagirk û şerme-

zarîş bo ewena debêt ke debne kewasûrî ber leşkirî Turke dagirkere û faşîstekan.

Kewate katî ewe hatiwe gelî qaremanî Kurd, niwênerî rasteqîney xoy binasêt be hemû hewil û tiwanayekîşiyewedestî komek û yarmetî bo dirêj bikat. Paşeroj berdî binaxey rastî narastî hemû şitû diyarde ciyawazekane. Serkewtîniş her beşî gelanî zorlêkirawî çihane!

## ENCÛMENÎ NÎŞTÎMANÎ KURDISTAN

Be mebestî xizmet kirdinî dozi reway gelî Kurd û serbexoyî Kurdistan helbijêrdirawe. Yekemîn erkî gewrey encûmenî newbiraw, rageyandinî nawçey azadkirawekan debêt, wek nawçey bindestî şoriş.

Em newçeneş kem û zoryan tê dekwêt, be giwêrey geşesendin û ber bilawbûnî deselatî şoriş.

Her kesêki Kurdperwer û dilsozî Kurdistan, bê taybetîş roşinbîran, ewe dekwête estoyan ke bibne parêzerî em deskewte niştîmanîye û be dil û dekwetê estoyan ke bibne parêzerî deskewte niştîmanîye û be dil û giyan xoyanî bo fîda biken.

Hemûman ewe dezanin take rêgey serkewtîni Kurdistan û şadbûnî geleye be serbexoyî û serfirazî, be piley yekem bestirawetewe be yekêti neteweyî û yekgirtûyî Kurdan lenêw xoyanda.

De kewate ba yek bigrîn û bine yek hêz le beramber dujminanmanda!


## XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

**Çeperast:** 1-Nivîskarê romana Binevs Egal 'Bêrivan'ê. Li Êriwanê dijî. di wênê de tê ditin 2-Cihê bazara genim/ Hinar/ Qet 3-Fikra gel 4-Navê Hezexê yê bi Tirkî/ Li welatên Amerîkaya Latîni navekî mêran 5-Xwarineke bingehîn/ Eks/ Li Vietnamê navê bajarek 6-Vêcarê/ Erd, xwelî 7-Di çanda Romaya mîtolojîk de, yezdanê evînê/ Yê ji dê û bavê mirov 8-Celebek nanê pehtîne 9-Zad lê dihêrin/ Hestiye singê mirov 10-Ji Tirkan re tê gotin/ Bajarek li Fransa

**Serejêr:** 1-Ji nû ve bi jin bûn/ Navê mehek 2-Ard/ Her dem/ Şuştin 3-Bombe 4-Sala tê de tê jîndin/ Bi Tirkî bilêvkirina Ereban 5-Qral/ Sembola Kûrçatovyûmê/ Ne şerî. 6-Navê qewmekî kevin ku li Mezopotamya û welatên Ewrûpa belav bûne/ Şîr dotin 7-Nebatek, neynoka bûkê/ Bi dimilî çûndin 8-Ê ku karê dîn û dewletê ji hev cuda digire/ Pîrek, jin 9-Derpêşkirin 10-Fêkiyek 11-Bi erebî bawerî 12-Sembola Neonê/ Di tipê de navê serhestiyê gilover

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



## BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

**Çeperast:** 1-Beşîr Botanî 2-Agirî/ Litoke 3-Biyani/ Rîtol 4-ETA/ Gram/ Ana 5-Re/ Otel/ Af 6-Nîsan 7-Au/ Asit 8-Basra/ Rê 9-An/ Encam 10-Sot/ Ame **Serejêr:** 1-Babet/ Aba 2-Egît/ Nuans 3-Şiyarî 4-ÎRA/ Esaret 5-Ring/ Asan 6-Îronî/ Ca 7-Ol/ AT/ Tram 8-Tîrmeh/ Ême 9-Atî 10-Nota 11-Îkona 12-Elaf

## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16

Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87


Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM



# Navên keçan bi Kurdî

<b>(A)</b>	Besna	Dilpak	Gulîşa	Heynar	<b>(L)</b>	Newroz	Rawêj	Sêwexan	<b>(W)</b>
Adan	Bestûn	Direxşan	Gulîzar	Heyran	Lalereng	Newşîn	Rabûn	Silîva	Weşîn
Agîrîn	Bexşîn	Direwşan	Gulroj	Heyrancan	Lalerû	Nexşîn	Rengîn	Sirûd	<b>(X)</b>
Ajîn	Beybûn	Dicle	Gulşa	Hêlan	Lalezar	Nêrgiz	Reşmal	Sirûşt	Xalxal
Ajna	Bêlim	Dîdan	Gulkelem	Hêfî	Leman	Nîgar	Reşpoş	Sîber	Xatûnaz
Ajwan	Bêlimcan	Dîdar	Gulîser	Hêfîcan	Lerzane	Nîlûfer	Revînd	Sîmal	Xelat
Alîn	Bêmal	Dîmen	Gulşan	Hêfîn	Lêvken	Nîşîman	Revîn	Sînem	Xemlîn
Alîsor	Bênav	Dîlan	Gulsînem	Hêvî	Lorîn	Noşîn	Rewan	Sînemxan	Xemrevîn
Alûs	Bênaz	Dîlê	Gulşen	Hêvîn	Lorîcan	Nûjen	Rewşan	Sîpel	Xezal
Arda	Bêrî	Dîlok	Gulşenî	Hofîxan	Lorîstan	Nûşen	Rewşen	Spehî	Xêbûr
Ariya	Bêrîgiyan	<b>(E)</b>	Gulferî	Hofî	Lorzîn	<b>(P)</b>	Rewşîn	Spehîn	Xêlî
Arîman	Bêrîvan	Edgar	Gulşêrîn	Hoybûn	<b>(M)</b>	Pakdil	Rexsan	Sîwan	Xêfîcan
Arîn	Bêstan	Efsan	Gulper	<b>(J)</b>	Mazîlan	Pakyar	Rexşan	Sorgul	Xincîla
Arjen	Bêxal	Erxewan	Gulperî	Jarîn	Medya	Parîze	Rêjav	Sosîn	Xîrxal
Arêz	Bîhar	Etûn	Gulxatûn	Jêlî	Medrûm	Pelşîn	Rêjing	Sorîn	Xivşê
Armûş	Bîhok	Esmer	Gulxan	Jêlîyan	Memêxan	Pelgul	Rêjgeh	Sozan	Xizêm
Arûng	Biheşt	Esmercan	Gulxan	Jilvan	Menc	Pelêrîn	Rêvîn	Stî	Xizêmşor
Astêr	Bijîn	Esmerxan	Gulxendan	Jîla	Mencol	Pelîn	Rêwan	Stêrk	Xonçe
Asê	Bilîcan	Esmîxan	Gulreng	Jîn	Mêrg	Penî	Rêwas	Sfran	Xonçegul
Askewan	Binav	Esrîn	Gulrû	Jîyan	Mêrgul	Penî	Rêzîyar	Surmexan	Xoşeng
Asrîn	Binefş	Estêr	Gulşad	Jîyar	Mîjgan	Pereng	Rêzîn		Xoşîn
Aşnaw	Binefşîn	Evîn	Gulnav	Jorîn	Mîzgîn	Perîxan	Rîhan	<b>(Ş)</b>	Xoşrû
Aşfî	Biwar	Evser	Gulnaw	<b>(K)</b>	Mîdya	Perînaz	Rîşan	Şadîman	Xorhelat
Aşfîn	Bînahî	Ewîn	Gulzar	Kanyaw	Moran	Perîgul	Robîn	Şadûman	Xorîn
Avbîn	Boran	Ezcan	Gozel	Kejal	<b>(N)</b>	Perwîn	Rojda	Şagul	Xoşawaz
Avîn	Borîn	Êşîn	<b>(H)</b>	Kejê	Nalîn	Perwîn	Rojbîn	Şaneşîn	Xoşîman
Avşîn	Bostan	Êtûn	Havîn	Kelîjan	Narînc	Perçem	Rojîn	Şanaz	Xozgeh
Avzen	Bûkan	<b>(F)</b>	Hawdîl	Kesrewan	Narîncan	Pergul	Rojîn	Şaniyaz	Xuşkan
Avzêl	Bûdil	Ferzê	Hawjîn	Kevok	Navcivan	Perînas	Rojgul	Şaperî	Xumar
Awêsta	<b>(C)</b>	Firyal	Hawdem	Kewyar	Nawbahar	Pesnexan	Ronahî	Şaper	Xumrîşan
Aweste	Cejn	<b>(G)</b>	Hejîn	Kezîban	Nawciwan	Pexşan	Ronak	Şarîstan	
Avtaw	Cejnê	Gazîn	Henar	Kezîzer	Naze	Peyman	Ronya	Şayîcan	<b>(Y)</b>
Awîng	Ciwandîl	Gela	Hempa	Kezîpan	Nazenîn	Pêrûz	Roşîn	Şayesta	Yargul
Awîng	Ciwane	Gelawêj	Hevjên	Kildan	Nazê	Pîrhêst	Roşen	Şayîzaman	Yardîl
Awîng	Ciwanxan	Gerdengaz	Hevjîn	Kilkêş	Nemal	Pîrnaz	Roza	Şehnem	Yarîn
Awîng	Cihan	Gerdîn	Hevîn	Kubarcan	Nermîn	Pîrşeng	Rozerîn	Şemîn	Yasemen
Awîng	Cûdiya	Gerdûn	Hewraz	Kulîk	Nesrîn	Pîjan	Ruxsar	Şengal	Yasemîn
Awîng	<b>(B)</b>	Geşîn	Hewzcan	Kurde	Neşmîl	Porşeng	Rûbar	Şemlê	Yekbûn
Awîng	Çavîn	Geşaw	Hewşan	Kurdê	Newal	<b>(R)</b>	Rûbîxal	Şenul	Yekcan
Awîng	Çawbelek	Gewez	Hewşîn	Kurdîstan	Newîn	Rabîn	Rûciwan	Şengê	Yekmal
Awîng	Çawgeş	Gewher	Heycan				Rûçem	Şengî	Yekser
Awîng	Çawkejal	Gewzîn					Rûgeş	Şengî	Yezdaxan
Awîng	Çawşîn	Gewrê					Rûken	Şenîsan	
Awîng	Çeman	Gezîza					Rûpak	Şengul	<b>(Z)</b>
Awîng	Çengzêz	Gêlas					Rûşen	Şermîn	Zarîn
Awîng	Çilkezî	Gêlaz					Rûxoş	Şevbîn	Zarşêrîn
Awîng	Çinar	Gijlok						Şevîn	Zelal
Awîng	Çirûsk	Gilyaz						Şevnem	Zendesor
Awîng	Çîryan	Gizing						Şeyda	Zend
Awîng	Çîmen	Giyabend						Şêgûl	Zendê
Awîng	<b>(D)</b>	Gulbend						Şêwîrîn	Zendî
Awîng	Delal	Gulbend						Şêwîran	Zengî
Awîng	Demgul	Gulbanû						Şîmşal	Zengesor
Awîng	Demkul	Gulbaran						Şîlan	Zernîşan
Awîng	Dengîn	Gulbarî						Şîne	Zerdek
Awîng	Derman	Gulbarîn						Şînok	Zerdele
Awîng	Dersdar	Gulbax						Şîrîn	Zerenci
Awîng	Dersîma	Gulbeden						Şîrînnaz	Zerdê
Awîng	Desmal	Gulbeser						Şîyan	Zerî
Awîng	Devken	Gulbest						Şolîn	Zerîn
Awîng	Dêrgul	Gulbejn						<b>(T)</b>	Zergul
Awîng	Dihok	Gulbîn						Tacîn	Zerpoş
Awîng	Dilan	Gulcan						Tanya	Zerya
Awîng	Dilaram	Guldan						Tavîn	Zerzeng
Awîng	Dilawaz	Guldar						Tenya	Zevîn
Awîng	Dilber	Gulê						Têfican	Zerzan
Awîng	Dilîstan	Gulçîn						Têfîcan	Zêrîn
Awîng	Dilsoz	Gulçîçek						Têfîxan	Zîravê
Awîng	Dilzîz	Gulçînar						Tîka	Zîlan
Awîng	Dilvîn	Gulnas						Tûjîn	Zîn
Awîng	Dilcan	Gulîstan						<b>(V)</b>	Zîvê
Awîng	Dilorîn	Gulfiroş						Vangul	Zîvîn
Awîng	Dilnîgar	Gulîxan						Vanrû	Zîwan
Awîng	Dilvan	Gulîsor						Vejin	Zomam
Awîng	Dilnaz	Gulîzer						Vîyan	Zome
Awîng									Zozan



Me ev navan ji pirtûka Amed Tigrîs "Navên Kurdî" girtin



# Serdestiya PKK'ê ji ku tê?

**Demokrasiya partiyên demokrat li Kurdistanê û komunizma partiyên komünist li welatên serdest û cîran bi dev ve çûne erdê. Sifat û rengdêrên mîna demokrat û komünist, navên balkêş û populer ew rizgar nekirin û nebûn xelaskirin wan ji felcbûn û şehtbûnê. Felcbûn û şehtbûna wan, laşê wan dixwe, dadverivîne û ji bo mişk û marên gorê, wan dike xwarin.**

Heger em grûb û komikên demdemî, demsalî û car car-nayî ku hebûn û nebûna wan di munaqesê de ye û li dora çend kovarên lewaz û bêqîram civiyane nekin dabaş, ji awirê pîrsa gelê Kurd û pîrsa şoreşê li Rojhilata Navîn sê tîp siyasî û sê celeb program hene:

1- Partiyên di bin navên demokrat de nas in û ji malbata partiyên demokrat in, mirov dikare wan bihejmêre.

2- Partiyên bi navê komunizmê kar dikirin û niha bê kêr in.

3- Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)

Celebên yekemîn ên duyemîn xwe li mêzênê kirin û bejna xwe pîvan. Rîtil û weqîya wan çend e û çî yê gelên herêmî nas kirin.

Demokrasiya partiyên demokrat li Kurdistanê û komunizma partiyên komünist li welatên serdest û cîran bi dev ve çûne erdê. Sifat û rengdêrên mîna demokrat û komünist, navên balkêş û populer ew rizgar nekirin û nebûn xelaskirin wan ji felcbûn û şehtbûnê. Felcbûn û şehtbûna wan, laşê wan dixwe, dadverivîne û ji bo mişk û marên gorê, wan dike xwarin. Mişk û marên gorê, kêzik û kurmikên bin erdê li bendeyî wan in, çavbel û dev ji hev di kemîna wan de ne û rîya wan dipên. Bi gotinên kurt û kin, ev partî rêwî ne û gerek êdî ji dinyayê xatirê xwe bixwazin. Ji niha ve mane saxên mirî, bûne malê dirokê û jiyane bi xwe terqîna wan xwendiyê. Rehma xwedê li wan be.

Cenazê yên me ne û gor-

kirina wan jî dikeve stûyê me. Rakirina cenazê wan û ji bo vê jî merasîm û formalîteyên tradîsyonîl (toreyî) dê hê demeke din jî me mijûl bikin. Em zêde li ber van partiyên nakevin. Ên ku li ber wan dikevin ne em in. Gelê

Partiya nayê zeftê, nayê qefê û sloganê "ji serxwebûnê bi rûmettir tiştêk nîn e" berz û bilind kiriye PKK ye.

Dewlet, rêvebir û desthelatdarên Tirk, piştgirên wan, dewletên çavbirçî û împeryalist, partiyek din mîna PKKê nanasin, di katalog û listeyên wan de partiyekê wiha tune, taze ye.

Reçete û çareyên împeryalîstan li PKK'ê kêr nakin, giş êrîş û hewlên wan vala derin û parti jî mezin û fireh dibe. Rê li mezinbûn û firehbûna PKK'ê nayê girtin. PKK, bajar bi bajar, dever bi dever û parçe bi parçe li we-

rastin û xwehimandinê ye. Pîrsa xwe parastinê, ji dijminên derve û nav xwe ji bo partiyekê cidî û xwedî mesûliyet, pîrseke serekî û ji pîrsên man û nemanê ye. Rojhilata Navîn, atmosfera xebatê li Rojhilata Navîn cihê ye, xweser e û ne mîna Ewrûpa ye. Partiyekê xwedî mîsyon û xwedî erkên dirokî, nikare pîrsa xweparastinê sivik bigire, di ser guhên xwe re bavêje û xwe bispêre tesadûfê û rehma Xwedê. Her partiyekê cidî xwedî gotin û layiqê navê partiyetiyê, bi dijmin û neyarên her awayî re, objektîf û subjektîf re, li

û altax, ji hundir de tebiqandin û hilweşandina partiyên yekemîn karê dewletê ye. Polis û îstîxbarata dewletê doleber li pey a din digerin, xefkekê li dû ya din vedide û partiyên ji hundir ve mîna kurm dixwe, dikuje.

Dewlet û dezgehên Şerê Taybetî, şareza û pisporên kuştinê, xerakirin û jîhevixtinê ne, Şarezaya wan piştî xwe dide qîrnan, nahêle tu çavên xwe vekî, raserî te hatiye û her hawe xiniziyê bi kar tîne. Didawesîne te, destên xwe xistiye qirika te û çav di nava serê te de beloq kirine. Hewara te fêde nake, dijmin bê rehim û bê wîdan e. Zebaniyê cehenemê ye, ji ruhsitên û melkemot jî zêdetir birçiyê canê te ye.

Tu bi hêzeke organîzekirî, xwedî pere, xwedî îstîxbarat û dezgehên polisî re, di pêxêra (paşila) hev de yî.

Partiyekê hemdem û serdema me van rastiyan dizane. Partiyek bi rastî partiyê, xwe li gora van rastiyan dihûne, li gora vê objektîvîteyê xwe ava dike û hiyerarşî û tedbîrên xweparastinê tîne pê.

Partiya nikaribe xwe biparêze, serokayetiya ku nikare partiya xwe biparêze, nikare bibe parêzgerê xelkê jî.

Di vî alî de jî Partiya Karkerên Kurdistanê, ji partiyên din yên Kurd û ne Kurd vediqete. Partiya Karkerên Kurdistanê di vî alî de jî pîr xweser û xwedî tecrubeyeke cihê ye, a ku PKK kiriye partiya îro hinek jî ev xurtî û hêza xweparastinê û xwehimandinê ye.

Dijmin bi hêsanî nikare têkeve nav partiyê, dikeve nav jî nikare xwe veşêre, zû derdikeve û zû keşif dibe. Çi ma giş grûb û partiyên muxalîf parçe parçe bûn, atomîze bûn û bûne komikên penaber û li derve û li hember PKK bû partiya sed sala me, hinek jî girêdayî vê pîrsê, pîrsa xweparastinê ye.



15 saliya Partiya Karkerên Kurdistanê jî bo gelê Kurd bi Meclîsa Neteweyî di warê navneteweyî de rûpelekî nû vekir.

Kurd û komeleyên zehmetkêş, karker û gundiyan Tirk, Ereb û Faris jî, li ber wan nakevin. Mirovên mîna Demirel û Özal li ber wan dikevin. Lewre ev partî ne ji xelkê re belê ji mirovên mîna Demirel û Özal re bûn alîkar.

Tîrsa dewletên dagirker, împeryalist û milîtarîst, ji partiyên demokrat û yên komünist nemaye. Ew bi tenê ji partiyekê hesaban dikin û ev partiye ya ku raserî çavên xwe kirine. Ew jî Partiya Karkerên Kurdistanê, PKK

lat digere.

Divê em bipîrsin: Partiya Karkerên Kurdistanê çawa bû hêza îro, çawa bû xurtirîn û zexmtirîn partiya siyasî li Rojhilata Navîn û ji ber çî partiyên demokrat û komünist perîşan in û ketine rewşa îro?

Hejmarek sebeb hene.

Ev sebeb fikrî ne, siyasî û îdeolojîkî ne. Rêxistinî û programatik in. Ji van hoyên (mercên) bingehîn pê ve sebebêk din jî heye ku hêjayê pêdaketinê ye. Ev sebeb jî, girêdayî pîrsa xwepa-

hember hev e û dorlêpêçayî ye.

Neyar û dijwarî ne yek û dudo ne, xerabî û komployên sed şiklî li qirikê ne. Dewletên dagirker, polisî û milîtarîstî ne. Mekanîzma sîxûrî û casûstiyê, mekanîzma bi tenê ye ku bê westan digere. Îşkence, binçokirin, zordarî û terora dewletê ne karê gotinê ye, bêqedar û bêqam e.

Lîstina bi mirovan, kîrîna însanan, dejenerekirina wan, dagirkirina partiyên radîkal û muxalîf bi mirovên sabotator